

# Hêvî Nayê Kuştin

# S

al 1946, ji  
rojan 22'ê

êbendanê, di werza ku  
we bi poşiya spî nixumandibû  
e çirayeke ronîdar vêket.  
v yek li Meydana Çarçirayê  
jewimî.


Wê hem çîka sermayê  
kand û hem jî reşî li  
spîtahiyê zivirand.

Le şevşevokên neyarên wê,  
ku dost û hezkirên  
rengê reş in, zû-zûkan  
êrîş birin serê.

Xwestin wê di 30'yê meha  
adara sala 1947'an de  
dîsa li Meydana Çarçirayê  
ditemirînin.

Lewre, ji wan re xweş  
diyar bû ku roja wan a  
pişdawayîyê çendî zû û  
bi lez ber bi wan tê.

Rûpel: 4 - 5



Nexweşîna li welatên îslamî "Artêş", Altan Tan di nivîsa xwe de rola "artêşan" tehlil dike. Rûpel: 7

Ismail Göldaş sedemên girtina Terakîperver Cumhuriyet Fırkası û têkiliyên wê yên kurdan re vedikole. Rûpel: 16

Hinek dikin û hinek dixwin, Rahmî Batur bi vî navî dizîya di warê muzîka kurdî de eşkere dike. Rûpel: 13

Tirkiye wê karibe MED TV'yê bigire, Felat Dilgeş girîngiya hebûna televîzyona bi kurdî  
û keftûleştên dîplomatîk ên Tirkiyeyê radixe ber çavan. Rûpel: 2



NAVEROK



6

Nevîyê Pîra Sarê Musa  
Anter: Ji penûsa Î. Ömerî



8

Dilşad Saîd: Mûzîka kurdî  
bûya parçeyek ji jiyana gel



10

Piştî hijdeh salan dîsa  
CEGERXWÎN

Ji xwendevanan

Xwendevanên me yên delal!

Adet e, hema bibêje hemû weşan di dereke weşana xwe de cih ji bo nameyên xwendevanên xwe vediqetînin. Em dê ji vê adetê pêk binin. Di vî quncikî de hûne karibin, bir û baweriyên xwe, nêrîn û ramanên xwe, nixxandin û rexneyên xwe yên li ser weşanê eşkere bikin.

Mabûn û temendirêjiya weşanekê bi têkili û eleqariya xwendevanan ve girêdahî ye. Ma weşan ji bo kê derdikeve û li kê deng dike?

Ji vê hejmarê bi şûn de em li benda nivîs, rexne, nixxandin, pêşniyaz û hwd. yên we ne.

*Emê  
we bi  
xwendina  
zimanê kurdî  
bitamijînin.*

Hêvî nemir e.

Çima hêvî nayê kuştin? Ji ber ku hêvî nemir e. Lewre navê manşeta me "Hêvî nayê kuştin" e.

Derketina rojnameya me rastî salvegera avakirina Komara Mehabadê hat, 50 sal berê di tariyêke tîr-şê de çirayek ji bo kurdan veketibû. Çendî kêliyêk bi şûn de ew hatibe vemirandin jî, hêvî nehatiye temirandin.

Ronîxwaz, li ser wê şopê, bêyî ku averê bibin, ber bi armancê diçin. Carek, hîmê evîna gel ji zû ve hatiye danîn. Ew jî baş hatiye meyandin.

\* \* \*

Pêwist e, der barê weşanê de jî em çend agahiyan bidin.

Me gerek nedît ku em bibêjin "Em çima derdikevin." Dema ku Rojnameya Welat dest bi weşana xwe kiribû Apê Mûsa di quncikê xwe yê bi navê "Tîr" de "Çima em

WELAT

dernekevin", digot. Em jî vê gotina wî bi piştî çar salan dubare dikin.

Naveroka weşana me dê pirtir li ser nixxandin û hêjahiyên çandî, hunerî, folklorî, wêjeyî, dîrokî û hwd. ên kurdî be. Aliyên wê yên nûçeyî û siyasî dê hindik bin. Me got siyasî, divê neyê wê maneyê ku rojname têkiliya xwe hîç bi siyasî nake. Ma jiyana bêsiyasete dibê?

Li ser zimanê kurdî jî pêwistî bi çend gotinên zelalê heye. Di vê hejmara me ya pêşîn de heman heman hemû nivîs bi zaravayên kurmançî ne. Ji ber çî ev rewş li me qewimî? Mebesta me ew e ku em bi qasî hev cih bidine zaravayên kurdî (zazakî, soranî, kurmançî û...) lê derfet û rewş destûr nadin me. Kesên ku ji me re bi kurmançiya jerê (soranî) û kirdikî (zazakî) dinvîsin, hema bibêjin hemû li Ewrûpayê dijîn. Ji lew re nivîs di wextên xwe de negihiyane me. Sedem ev e.

Di hejmarên pêş de hêviya me ew e ku, em bi nivîsên ji wan zaravayan jî derkevin

pêşberî xwendevanên xwe yên hêja.

Weşana me bi aweyekî fireh li mijaran û rewşa gelê me dinihêre; bi rengêkî neteweyî. Rûpelên me ji her kesî û ji her ramanê re vekirî ne.

Ji aliyê nivîskaran ve jî em xwediyê kar-doyeke tîr xurt û gihîştî ne. A.Melik Firat, Altan Tan, Lertzan Jandîl, Mirhem Yîgît, Amed Tîgrîs, J. Espar, Dr. Kemal Mîrawdelî, M. Emîn pencwînî, Firat Cewerî, Şerafxan Cizîrî, Dilbixwîn Dara, Hesênê Metê, Dr. Cebar Qadir, Jan Dost û ... Ev lişte hîn jî dirêj dibê.

Gotina dawîn jî bila ji Apê Mûsa be: "Xortên kurdan, îcar ez û hûn li hev. Heta niha we guhê min bir. Çima ez bi kurdî nanivîsim? Aha ez dinivîsim, îcar ku hûn nexwînin kewnê we bû çî?" Apê Mûsa ev gotin di hejmara yekemîn a Welat de nivîsbûn.

Piştî van gotinên zelal em dê çî bibêjin? Aha me jî rojname derxist...

MEHMET GEMSİZ

Tirkiye wê karibe MED TV'yê bigire?

Ez ne bawer im ku di sala 1995'an de tu tiştî bi qasî avakirina MED TV'yê dewleta tirk aciz kiribe û ew ji cihê wê bi şid lerizandibe. Fersend û serkeftina ku kurdan bi avakirina MED TV'yê bi dest xistine, îro hê jî di destê gelek dewletên ku ala wan li navenda Neteweyên Yekbûyî bilind dibê tune. Bi qasî ku mirov destê xwe dirêjî kumandayê bike, Cizîr, Amed, Silamanîye, Riha, Hewlêr, Dêrsim û hemû bajar û herêmên Kurdistanê li pêş çavê mirov in. Ne sinor mane, ne jî asteng.

Gelo MED TV ne li Îngilistanê, lê li dewleteke ku ji tirkan re cîran e bihata avakirin êwê çî bibûya? Tirkan qet teksîr nedikir, wê di cih de leşkerên xwe bi ser wê dewletê de bişandana. Baş e, tirkan bi dewleta Îngilistanê çî kirin û wê çî bikin? Bi bihîstina avakirina MED TV'yê re şerekî leşkerî nebe jî, şerekî dîplomasiyê li dijî dewleta Îngilistanê li dar xistin.

Kesê ku serê vî karî dimeşîne jî Erdal Înönü ye. Di roja 10. 12. 1995'an de li Londrayê, li Balafirgeha Heatrowê Erdal Înönü digeriya. Ez bi xwe jî li wê derê bûm û em herdu jî li benda balafira ku emê pê biçûna Tirkiyeyê, bûn. Piştî ku em heta berê êvarê rawestînin, ber-pirsên rêhewayî yên tirk beyan kirin ku ji ber mijê, dê balafir ranebe û rêwiyên îro divê sibê bîn.

Erdal Înönü jî li ba me bû û li ser vê yekê me dest pê kir, em bi wî re peyivîn. Kengê ku kesên din xwe ji dorê dan alî, hingê min di dilê xwe de got "Keys ev keys e. Ezê vê mesela girtina MED TV'yê jê bipirsim; çimkî ez bawer im sedema hatina wî ya vira ev e." Min jî Înönü re got:

- Paşa, bi destûra te be ezê pîrsekê ji te bikim... Camêr bi dilnizmî ji min re "Fermo", got.

- Paşa ez nivîskarêkî kurd im; Li ser Têkiliyên Navnetewî doktorayê dikim.. Paşa gotin min birî û pîrsî,

**Mesut Yılmaz û Tansu Çiller li ser avakirina televizyoneke bi kurdî li hev û din kirine. Axaftina Necmettin Erbakan a li Diyarbekirê jî teyîd kir ku haya vî camêrî jî ji vê yekê heye. Bi avakirina GAP TV'yê armanca Özal televizyona kurdî bû; lê çend sal piştî wî be jî, bi xêra MED TV'yê berpîrsên dewleta, tirk ne televizyoneke kurdî, lê televizyoneke bi kurdî ya ku wê bibe dengê xwe dixwazin.**

FELAT DILGEŞ

- Tu li Londrayê dixwînî?

- Na xêr ez li Zanîngeha Stenbolê dixwînim. Pîrsa min ji we ev e: Bi qasî ku ez dizanim hûn ji demeke dirêj ve ye ji bo girtina MED TV'yê bi dewleta îngilîz re di têkiliyê de ne. Hûnê bikaribin MED TV'yê bigirin?.. Bi bihîstina vê pîrsê re paşa sar bû, mirûzê xwe kir; bi her weha bersiva min da,

- MED TV ya PKK'yê. Dewlet nikare bi terorîstan re rûne! PKK rêxistineke terorîst e!.. Îcar min gotina wî birî.

- Baş e Paşa, hûn dibêjin MED TV ya PKK'ê ye. Wekî ku hûn jî dizanin li Tirkiyeyê di ser bîst milyonî de gelê kurd dijî. Ji bo gelê tirk 400 televizyon û 4000 radyo hene. Gelo ma qet ji bo kurdan jî radyo û televizyonek nakave. Hûn vî mafî ji bo kurdan nanasin? Paşa dîsa bi hêrs:

- Kurd dikarin bi zimanê xwe bipeyivin. MED TV ya PKK'ê ye!..

- Rast e, bi gotina we dikarin stranên jî bibêjin...

- Dewlet nikare bi terorîstan re rûne... Mesut Yılmaz bi serokwezîrê re peyiviye, wê vê meseleyê çareser bikin!... Tam di vê navê de yekî ji piştî ve, bi nermikî destê min sê caran li ser hev şidand. Jixwe çend kes her gav ji nêz

li pey paşa bûn û min dizanibû ku wî bi tenê nahêlin. Bi dengê bilind peyivîna Paşa jî îşaretek bû. Ez li pişt xwe zivîrim, camêr bi awayekî nermikî ji min re wiha got: " Bi vî awayî hûn li vir nepeyivin dê çetir be.."

- Na tişt tune, mexsed me bi Paşa re sohbet dikir. Di vê navê de hê jî Paşa dipeyivî, ez lê zivîrim û min got:

- Paşa hûn dizanî, ev mesele bi qasî ku li ser lingan neyên peyivîn dirêj in. Min dixwest ku bi bêheke fireh mirov bipeyiviya...

- Bêguman, bêguman! Çima emê nepeyivin, divê em bipeyivin... Ez dîsa li pişt xwe li yê ku destê min şidandibû zivîrim û min jê pîrsî:

- Gelo hûn parêzkarê wî ne, an ku hûn hevalê Paşa ne?

- Na ez hevalê Paşa me, em hevalê hev in. Îcar wî ji min pîrsî.

- Tu ji ku derê yî?

- Ez ji Diyarbekirê me.

- Tu ji ku derê yî?

- Ez jî, ji Diyarbekirê me.


Dotira rojê em û Paşa dîsa bi eynî balafirê zivîrin Tirtiyeyê. Çend caran çavê me bi hev û din ketin, lê ne wî tiştêkî ji min re got û ne jî min rast dît ku ez jê tiştêkî bipîrsim. Çimkî min dizanibû ku em diçin kîjan welaftî û dîsa min dizanibû çihên kesên ku li wî welaftî dipeyivin û dinivîsin ku li derê ye.

Bi ya min tiştê ku Paşa di vê peyivînê de bi devê xwe şehitîbû ev bû: Mesut Yılmaz û Tansu Çiller li ser avakirina televizyoneke bi kurdî li hev û din kirine. Axaftina Necmettin Erbakan a li Diyarbekirê jî teyîd kir ku haya vî camêrî jî ji vê yekê heye.

Bi avakirina GAP TV'yê armanca Özal televizyona kurdî bû; lê çend sal piştî wî be jî, bi xêra MED TV'yê berpîrsên dewleta tirk ne televizyonek kurdî, lê televizyonek bi kurdî ya ku wê bibe dengê xwe, dixwazin.

We got MED TV! Wê xwişkên wên ên din jî çêbin, lê ne ji hêwî û demariyan!






**MEBÛSÊ** kurd ê berê û neviyê Şêx Seîdê Pîranî Melîk Fîrat, roja 15'ê rêbendanê li Stenbolê hate girtin. Polîsan pêşî ew birin Emniyeta Stenbolê şaxa terorê. Fîrat di eynî rojê de derxistin DGM'ya Stenbolê û paşê jî ew şandî Girtîgeha Bayrampaşayê.

Lawê Melîk Fîrat, Mahmut Fîrat girtina bavê xwe wekî biryareke siyasî bi nav kir û da zanîn ku bavê wî li ser îfadeya îlrafkarekî hatiye girtin.

Piştî ku Melîk Fîrat ji DYP'ê îstîfa kiribû, dewletê jî berê xwe dabû wî. A. Melîk Fîrat di hilbijartina de piştigiriya HADEP'ê kiribû.



**NÛÇEVANÊ** Rojnameya Evrenselê Metin Göktepe hate kuştin. Delîl polis nişan didin Metin roja 9'ê rêbendanê di ayîna çendikê dîlan de ku li Girtîgeha Ümraniyeyê hatibûn kuştin, tê girtin. Polis wî dibin Salona Sporê ya Eyûpê dotîra rojê li derve cendekê wî tê dîtin. Rayedarên dewletê qebûl nakin ku Metin Göktepe ji aliyê polîsan ve hatiye girtin. Lê bi şahidiya nûçevanên din û şahîdên ku pê re di binçav de bûne, polîs berpîrs tê girtin.

Çapemeniya tirk ku heta niha li rojnavanên kurd xwedî dernediket, li hemberî wê bûyerê bêdeng nema.

## NÛÇE

# Li Tirkîyeyê gelemşeyan dane qirikê


### DIK

#### Rastî û nerastî

**D**i despêka sersala nû de li Tirkîyeyê dîsa derew, xwîn û kuştin hebû. Di nava Meclîsa Komara Tirk de ku hemû partiyên ku hebûn; ji aliyên temsîlkirina gel ve pêwistiya hilbijartinekê anîn ziman. Lê belê ji ber baraja ku danîn pêşiya partiyên, tu maneyeke hilbijartinê nema. Dûv re kifş bû ku, ew sond û gotin tenê ji bo vêşartina derewên neteweyî ne. Problema ku di vir de derdikeve pêş, îstîkrara sîyaseta Tirkîyeyê ye. Di demeke kin de dîsa eşkere bû ku, ev hilbijartin jî ne çare ye.

Mijara duyemîn ew e ku, Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, dema ku şer rawestina bêqewl û yek alî îlan kir. Baweriya tu kesî ji Komara Tirk tune bû. Lê ev fikr rast derket, ji ber ku hêzên artêşa dewletê dev ji nêçîra gel bernedaye. Êdi tê zanîn ku Komara Tirk, sîyaseta xwe li ser şerê qirêjî amade dike û ew qirêjahiya şer armanca wan 'ronî' dike; her wiha ev yek pilçiqiye bajarên Tirkîyeyê jî. Jixwe, qetilkirina girtiyên çep û peyve îspat dike. Mijara sêyemîn jî, malbata karsazên herî mezin yê Tirkîyeyê, malbata Sabancı, endamekî xwe winda kir. Piştî bûyera Girtîgeha Ümraniyeyê tê gotin ku, endamên DHKPC'ê ji bo heyfa bûyera dawî êrîş birine ser Centera Holding a Malbata Sabancıyan. Di vê êrîşê de ji birayên sabancıyan yê herî biçûk, Özdemiş Sabancı, sekretera Sakip Sabancı Nilgün Hasefe û Gerînendeyê Holdingê yê Giştî Halûk Görgün hatin kuştin. Ji bo analîza wê bûyerê gelek tişt hatin gotin û hîna jî tê gotin. Îcar li gorî me tiştên herî muhîm nediyarkirina senaryoyên nû ne. Bi ya min tiştê herî girîng ev e. Piştî bûyerê çî mesele derketin û wê derkevin. Lê tiştê bêsîk ev e ku delîlên polisên tirk mirov dilrêş dike.

DÜZGÜN DENİZ



Abdullah Öcalan



Tansu Çiller



Necmettin Erbakan



Mesut Yılmaz

**D**i 13'yê berfanbarê de Parlamentoya Ewropayê endamtiya Tirkîyeyê ya Yekitiya Gumrikê pejirand. Rayedarên tirk ew wekî serkeftineke mezin bi nav kirin. Parlamentoyê tevî wê yekê, biryarnameyê li ser doza kurdî jî bi piraniya deng qebûl kir. Di vê biryarnamê de dihat xwestin ku doza kurdan bi riya siyasî bê safîkirin. Parlamentoyê yekemîn car PKK wekî aliyekî şer bi nav kir û ji her du aliyên şer xwest ku, meseleya xwe bi riya gotûbêjan hel bikin.

#### Ewropa ji Tirkîyeyê êdî berpîrs e

Piştî re di 15'ê berfanbarê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, agirbesta ku PKK ji berê ve amadekariyê wê dikir, diyar kir. Abdullah Öcalan eşkere kir ku wan ji bo pêkanîna daxwaza gelê kurd û tirk, ew biryar girtine, her wiha diyar kir ku, agirbesteke yekalî nikare zêde bido-me. Öcalan bang li Parlamentoya Ewropayê jî kir û xwest ew li biryara xwe xwedî derkeve. Öcalan bi bîr xist ku ji îro pê ve Tirkîye êdî wekî enda-

#### SAMÎ BERBANG

mê Yekitiya Ewropayê dikare bê qebûlîkirin; ji ber wê yekê jî kirîna dewleta tirk ew jî berpîrs e. Agirbestê li dinyayê deng veda, tevî gelek rewşên û şexsiyetên navdar, Koma Keskan û Sosyalîstan ên li Parlamentoya Ewropayê jî piştigiriya xwe diyar kirin. Li Tirkîyeyê jî tevî xwekerkirina rayedarên dewletê û domkirina operasyonên hêzên dewletê û kuştina gerîlayên PKK'ê, kedar û aşîxwazan piştigiriya xwe anîn zimên.

#### Hilbijartin ji krîzê re nebû çare

Hilbijartinên 24'ê berfanbarê, ji ber hebûna agirbestê di atmosfereke nerm de derbas bû. Hêzên welatparêz, demokrat û sosyalîst Bloka Aşti, Ked û Azadiyê ava kirin û di bin sîwana HA-DEP'ê de ketin hilbijartinê. Tevî partiyên wekî DDP, SIP, BSP'ê gelek rêxistinên demokratîk û sendikayan di nava blokê de cih girtin. Her wiha gelek rewşên bîran jî bi awayekî eşkere piştigiri-

dan blokê. Her çiqas blokê benda % 10 derbas nekiribe jî, hêviya gelê kurd û aşîxwazan ji bo azadî û demokrasîyê bilind kir. HADEP'ê bi giştî % 4.2 ray stand, lê piraniya wan li Kurdistanê, 23 mebûs dan hilbijartin.

Li aliyê din hilbijartinê tu derdê dewleta urk derman nekir. Ne di warê rawebûnê (meşrûbûnê) de, ne jî di warê krîza siyasî de. Nûnerên gelê kurd dîsa li derveyî parlamentoyê man. Îcar partiya faşîst MHP'ê jî nikaribû beudê derbas bike û li derveyî meclîsê ma. Di hilbijartinê de Partiya Refahê, bû partiya yekemîn, lê nikare bi kesî re hikûmetê ava bike. ANAP û DYP li ser Serokwezîriyê li hev nakin; CHP û DSP inçex karin bibin dîvik, wisa xuya ye wê krîz dewam bike.

Piştî hilbijartinê krîza aborî û siyasî bandora xwe bi tundî nişan da. Di despêka sala 1996'an de hêzên dewletê li Girtîgeha Ümraniyeyê, êrîş bir ser dîlan, çar dîl kuştin, 60 dîl jî birîndar kirin, dîsa di ayîna çendikê dîlan de bi hezara mirov girtin û di bin çavan de ji nûçevanek kuştin. Tevî wê bûyerê, kuştina karsazê tirk Özdemiş Sabancı deng veda.



# Pencî sal berê **Komara**




**Ava kirina Komarê bala hemû kesên welatê parçekirî kişand.**

**Eşîra Sekayan ku di Çiyayê Agiriyê de dijiya bi tevî Serokê xwe Şêx Hesên (Hesên Kotan) serî li Komara Mehabadê da. Şêx Hesên demeke dirêj li wir dimîne û alîkariyê dide Komarê.**

Ev wênê cara pêşîn di rojnameya welatê de hatibû weşandin.  
(Welat sal: 1 hejmar 46, rûpel 16, 3-9 Çile 1993)

## *Hêvî nayê kuştin*

ZANA FARQÎNÎ



Cihê deqdeqî sînorê Komarê Mehabadê a sala 1946'an nîşan dide

**S**al 1946, ji rojên 22'ê rêbendanê, di werza ku xwe bi poşiya spî nixumandibû de çirayeke ronîdar veket. Ev yek li Meydana Çarçirayê qewimî. Wê hem çika sermayê şand û hem jî reşî li spîtahiyê zivirand. Ev yek li kurdan wekî birq û bilêçan hat, dîtî û nedîtî.

Şevşevokên neyarên wê, ku dost û hezîrên rengê reş in, zû-zûkan êrîşê birin serê. Xwestin wê di 30'yê meha adara sala 1947'an de dîsa li Meydana Çarçirayê bitemirînin. Lewre, ji wan re xweş diyar bû ku roja wan a pişdawayîyê çendî zû û bi lez ber bi wan tê.

Pîçek be jî hewceftî, bi ravekirina wê demê heye. Bi kurtî li ser wê demê ya beriya damezirandina Komarê mirov dikare van agahiyan bide.

Li gorî şert û mercên heyî yên wê çaxê, serok û giregirên kurdan, têdikoşin ku encamêkê bi dest bixin. Li rojhilatê welatê xwe, Komeleyî Jiyanebeyî kurd, (J.K) dadimezirînin. Bi rêxistina siyasî "Hêvî"yê re, ya ku li Başûr jî aliyê kurdan ve hatibû avakirin, têkilî datîne. Rayedarên Hêviyê jî diçine Mehabadê.

Ji kurdên Bakur, neviyê Cemilpaşayê Diyarbekirî, Qedîr Cemilpaşa jî ser li wan dide, ji bo pêwendiyên siyasî.

Li ser qewmî û rûdanan, J.K cihê xwe dide partiya Demokrata Kurdistanê. Ji Başûr Berzanî, bi serokatîya Mele Mustafa têne Mehabadê. Bi kurtasî kurdên ku agirê azadî û serbestiyê di hundirê wan de hildibe, xwe ranagirin, berê xwe didine rojhilatê welatê xwe; ji bo wan cihê ku roj lê hiltê.

Û Komar tê ragihandin; hem jî di nîveka zivistanê de di bin taveke tûj û germ de. Tê gotin ku ew rewşa hewayê gelek

**Komar di dema hewayaya Cenga Cîhanê ya Dudiyan de hate avakirin. Ji ber ku Riza Şah piştewantiya Almaniyaya Hitler dikir, Sovyetê jî bakur ve Amerîka û Îngilistan jî, ji başûr ve Îran vegirtibûn. Di vê rewşê de kurd hatibûn bîra van dewletan û daxwazên kurdan ên kelemçekirî serbest berdidan.**

**Serekê kurdan xwedî hêvî û baweriyê bûn ku piştî şer jî wê komar li ser piyan bimîne û êdî xwestin û daxwazên bi can giyan bûbûn.**



# Mevivê Pîra Sarê

## MUSA ANTER

**A**bdullah Çivak, bi kurtasî me jê re digote Ebo, mixaletiyê Kekê Mûsa ye. Di sala 1959'an de çûbû Stenbolê, mala mixaletiyê xwe Musa Anter. Ta sala 1967'an, zewicî jî di nav mala Mûsa de kar û suxreyên wî dikir. Mirovên ku di salên şest û heftêyan de têkilî bi Mûsa re datanîn û diçûn mala wî, hemû Ebo dinasin. Ebo, xortekî ji mîrgeha Mêrdînê ji gundê Qurdîsê ye. Nexwendî lê zehf şareza bû. Li Stenbolê têkiliyên xwe bi zana û xwendevanên pêşverû re datanîn.

### Ne lawo hişê min nemaye

Di mijara rêzanî (siyasî) de jî, ji gelek xwendevanan bi pêşketîr bû. Xortekî devliken, sernerm, pêşverû û sexî bû. Dapîra wî hebû, li gundê Qurdîsê rûdinişt. Di dawiyê jiyana xwe de xurîfî (şeyda) bû. Ango hişê xwe wînd kiribû. Temenê wê li dora 87-90 salan bû. Xalê Mûsa digot:

– Wê salê ez çûbûm welêt, min hal û wextê pîra Sarê pirsî, pîrê wiha li min veşand: “Ma ne lawo hişê min nemaye” Min got: “Pîrê madem ku hişê te nemaye, naxwe çî di te de maye? Te nedigot berê hişê te mîna yê Evdalê zeynikê bû. Dîroka kurd û Kurdistanê tev di hişê te de bûn. Ji roja ku tu tîyî bîra min, tu ev bêhiş û bêmeji bûyî.” pişt re jî ev gotim me: “Bila di navbera min û we de be, zêde nebe dengî.” (Pîra Sarê dapîra kekê Mûsa ye).

Car caran ku Ebo tiştêk şaş an jî ji bir dikir, kekê Mûsa digot: “Ebo lawo, hişê te mîna yê dapîra te Sarê nemaye.” Ev peyv pir li telê Ebo diket û dijrabûna xwe tanî ziman (itiraz) dikir. Kekê Mûsa digot: “Ez te dişînim dikanê nanekî, tu saetekê jî xwe re digerrî, çaxa tu yê, destên te di bêrika te de ne. Ez dibêjim ‘Ebo ma ka nanê ku te anî’, tu dibêji, ‘Wele min ji bir kiriye.’ Ê lawo ku min du sê tiştên din jî, ji te bixwestana û te ji wan bir kiribûya, mafê te yê dijarbûnê de hebûya. Kuro ez te dişînim nanekî tu dibêji, ‘Min ew jî ji bir kir.’ Naxwe hişê te mîna yê dapîra te nemaye.

### Esnaf Musa Anter

Hîna nivîs kuta nebûbû li ser daktîloyê bû, min dimivîsand, Dr. Ezîz ji Fransayê hatibû. Şevêkê bû mêvanê min. Em ji aş û baş peyivîn. Me qala jiyana xwe ya li Stenbolê derbas bûbû û Kekê Mûsa dikir. Dr. Ezîz ji nişka ve got:

– Tu bi Xwedê bikî yek di nav mala Mûsa de hebû navê wî Ebo bû, diçû nanekî bikire ew jî ji bir dikir. Niha ew li ku dereye?

– Ebo niha li Stenbolê ye, kurê wî li Amedê perwerdeya doktoriyê dibîne û çîza wî li NÇM'ê kar dike. Kêf, kêfa wî ye. Bûyera wî û Kekê Mûsa jî va ye li ser daktîloyê ye, ez dimivîsim. Îcar em bîr ser mijara xwe. Carinan Ebo jî lep hiltanî û digot:

– Apê te Ehmedê Enter debeng bû, meta te bêmeji bû.

Tinazên xwe bi wan dikir. Ji ber ku tinazên wî bêsipartek û binyad bûn, tu kes bi qerfên wî nedikeniya; lê dibû tiqetîqa wî, ew bi qerfî û tinazên xwe dikeniya.

Di mêjuya 20.3.1993'an de ez li maynexanê bûm, min dît Ebo çentê wî bi milê wî ve û da derî. Ez pê ve rabûm. Me rûyê hev maç kir. Wê şevê li min bû mêvan. Min got:

– Ebo, tu bi Yezdan û gora Mûsa bikî, bûyera navbera xwe û Kekê Mûsa ji min re dubara bikî. Kitekite nayê bîra min. Tu nabêji Ebo ji doh ve minêkar bû. Dest pê kir û got: “Berî ku gişt bêne girtin (mixaletiyê Mûsa, Edip Karahan, Ali Karahan, Urfa Akkoyunlu, Yaşar Kaya, Sait Kirmizitoprak, Dr. İsmet Balkaş û birayê xwe, Dr. Faik Savaş, Emin Batur, Medet Serhat.... 50 mirovên neqandî bûn. Ji wan, ji girtîgehê 49 kes derketin) mixaletiyê Mûsa li Stenbolê, li Taksîmê, di navbera sê dibistanan de anga Franzi kizkoleji, Ermeni Lisesi û Atatürk Lisesi de bufeyek vekiribû. Ma-

**Gelek bernavkê Musa Anter hene, wekî Apê Şexo, Apê Mûsa. Zehf kes bêhtir aliyê wî yên siyasî, çandî, nivîskarî dinasin. Rast e, nuktedaniya wî jî tê zanîn. Me dil kir ku em hin aliyên jiyana wî ji pênuşa Î. OMERÎ car caran pêşkêşî we bikin û em Apê xwe bi bir bînin.**



mosteyên wan dibistanan zehf hez ji Mûsa dikirin û ku firsend dîtînin dihatin cem wî, galegal û guftugo dikirin. Gelek caran ez û wî li berê diman. Roja ku kar û şuxulê wî li cihekî din hebûya, ya Yaşar Kaya û an jî Faîq Savaş dihatin ber bufeyê, yarmetî bi min re dikirin. Tu rastiyan dixwazi, ez nû ji welat çûbûm, ne pir jîr û çalak bûm, lê dîsa min îdare dikir. Saet li 12.00'an ku zengilê bêhnvedana nivro lê dida, ji her sê dibistanan, suxte derdiketin û êrişî bufeyê dikirin. Doktor, dîtînin û gotin, ne mîna hevûdin e. Mîna meşerê, li ser serê me qîr û qiyamet bû. Her yekî ji dehma (hindama) xwe ve tiştêk dixwest. Di demeke kurt de, me ew suxteyan ji ser çavên xwe bi rê dikirin.

Gelek caran ji ber ku diravên hûr nebûn, an jî zehf bi lez û bez bûn, diravên wan li cem min diman, êvarê dihatin diravên xwe ji min distandin. Mûsa digot: “Ebo îcar ev çî ye?” Min digot: “Nivro diravên wan bi ser min ve hatibûn.” Gorbihuşt bi min de di-

xeyidî û digot: “Ma li cem te nivîsandî ye?” Min got: “Na. Ma di vê hengama nivroyê de ezê ji ku binivîsim. Jixwe zarok jî derewan nakin.” wî digot: “Kuro lawo jixwe tu ji mîna dapîra xwe bêhiş û kanê çiqas deyn li te hene û çiqas deynê te li cem zarokan hene?” Min “Ez nizanîm” digot. Ev jî, ji vî işî gelek diqehirî û bi ser min de dikir pitepit. Bersiva min ev bû: “Evqas ji min tê.” Ew jî desekîni.

Rojekî dîsa dora min û wî bû. Ez çûm, min bufe vekir, mixaletiyê Mûsa nehat. Ez bi tenê heq ji wan zarokan dermediketim. Nêzîkî nivro, min ji mixaletiyê Mûsa re telefon vekir û got, “Ka çima tu nayî?” Got: “Wele Ehmed Emce (Apê pîreka Mûsa bû) miriye, ez nikarim bi te ve bêm, de hema îdare bike.” Wê gavê aqil di serê min de nema. Min got: “Ez di tîrba Ehmed Emce de... Ma niha hawara mirina Ehmed Emce bû. Te ji sibehê ve ji min re bigotaya, mimê xeber bidaya Yaşar, dê bi min ve bihataya. Ez rebenê Xwedê, dê çawa bi van gedan re bibim serî.”

Hîna ez bi telefonê dipeyîvim, zengil lê xist û serê gedan derket. Rih ji min çû. Gede li min kom bûn, bar li min giran bû. Min dît ku ez bi wan re nabim serî, hema min derê bufeyê vekir, ez li ser kursiyê xwe rûniştim û min destûra wan li bufeyê da. Zarok ketin bufeyê, tiştên xwarin, yên şikandin, dawiyê belav bûn. Êvarê jî kesî tu dirav ji min re neanîn.

Êvarê min gelemşeya bufeyê rast kir, min destên xwe xistin berikên xwe. Min di dilê xwe de “Ger dapîra min e, ya te ye jî. De heta li min û te bibe beyan, Xwedê mezin e, ez vê heyfê ji te re nahêlim” got.

Yadinê (dotira) rojê ez û ew, em çûn, me bufe vekir. Wî roj-nameyên xwe dixwendin, çavê min ji hey li tolhildanê bû. Nêzîkî bêhnvedana nivro, min jê re “Ezê herime destavê”, got. Haya wî ji bayê felekê nîn bû. Got: “Here.” Ez çûm cihekî bala (bilind) raserî bufeyê, min li hal û rewşa wî temaşe dikir. Min dizanibû bê wê çî bihataya serê wî. Lê der heqê wî de bû. Ji ber ku ez gelekî eşandibûm.

### Ku suxte êrişî bufeyê bikin

Hîna ez wilo bûm, min dît bi çingîna zengilan, suxte mîna pûra mêşa hingiv li pey hev êrişî berqûdê (bufeyê) kirin û li ser serê mixaletiyê min kom bûn. Ê Xwedawo tu zanî bê çiqas kêfa min hat. Min di dilê xwe de “Ez te bibînim, ka tê çawa îdare bikî” digot. Her yekî ji hêla xwe ve destên xwe dirêji bufeyê kirine û du-sê tiştan bi hev re dixwazin yê ku digot, “Amca ewa hanê, amca tost, amca ava pirtiqalan, ava limonê, amca zû, ji her alî ve amca, amca, amca... (Ebo dema ku vedigot te digot qey wê rojê ji nû ve diji, xwe di nava bûyerê de didit.) Amca seriyê pêşî çend tişt dan destê wan, lê çaxa ku ber lê giran bû, bû pitepita wî, hema min dît deriyê berqûtê vekir, gede berdan hundir û got: “Xwedê we bihêle ez nikarim bi we re derkevim serî, ez nizanîm bê ew xwedênehişt jî bi kîjan dojehê ve çûye.” Zarok (gede) gişt ketin hundirê berqûtê, yê birin, yê şikandin, hundirê berqûtê gişt kirin gelemşe.

Wî jî, ji behecan re, rahişte şuşê votkayê û bû liqeleqa devê şuşeyê û bi ser xwe de kir. Min di dilê xwe de got: “De her, te dît bê çawa dew bira yê mast e.”

Paşê zarok belav bûn. Min destên xwe xistin berikên xwe, di bin simbelan re dikeniyam û mîna ku haya min ji tiştêkî nîn e, min ji xwe re bi kurmancî difikand û li derdora xwe dinihêrî. Ez hatim berqûtê ku çav li nava serê wî sor bûne û got: “Ev tu li kîjan dojehê (cehenemê) bûyî, emirqesifî, te ev qas zarok berdan ser çavê min û tu bi ku ve çûyî? Ma avrijandinek ev qas didomîne?” Min lê veşand: “Te digot, hêsan e, va ye te saetekê neqedand û te rewşa xwe dît. De bixwe, ma qey ez tenê neviyê pîra Sarê me?”



● 21 Rêbendana 1924:

Vladimîr İliç Lenîn çû ser heqîya xwe. Lenîn di sala 1871'an de li Sibîryayê ji dayika xwe bû. Di sala 1898'an de kete nav refên (SDWPR) Partiya Sosyal Demokrat a Karker a Rûsyayê. Di vê demê de rojnameyêke bi navê Iskra (Çirûsk) da derxistin. Bi van kirinên xwe ve amedekariya têkoşîna 17'ê kewçêrê kir.

● 22-Rêbendan 1946:

Komara kurdî ya Mehabadê di birt-serokatiya Qazî Mihemed de hat damezirandin.

● 21-Rêbendan 1926:

Belavbûna rojnameya "JİYAN" li bajarê Silêmaniyê

● 24-Rêbendan 661:

İmam Alî li bajarê Kufayê hate kuştin. Li sala 657'an, di navbera Muaviye û İmam Alî de şerê xelîfetiye derket. Gelê Suriyê hakek xwest, hakekan bîyar da ku Muaviye xelîfe ye. İmam Alî dev ji xelîfetiye berneda. Piştî ku ew li Kufeyê di 661'ê de hate kuştin, xelîfetiye ji ket destê Muaviye.

● 26-Rêbendan 1948:

Damezirandina Komara Hindîstanê Metîngeha İngîlîstanê Hindîstan, di bin serokatiya Mehatma Gândî de 1948'an e bi serhil-danekê gihîştê azadiya xwe.

● 27-Rêbendan 1299:

Dewleta Osmanî, li Sogûtê ji aliyê Ertuğrul Gazî ve bi navê Mîrîtiya Sogûtê hate damezirandin. Kurê Ertuğrul Osman dema bû padîşah navê dewletê danî Împaratoriya Osmanî.

AWIR



M. Arifê Cizîrî, dengbêjê mezin û mamosteyê gelek stranbêj û dengbêjên kurd. Tehsîn Taha der barê wî de wiha dibêje: Heke ew neba Tehsîn Taha nedibû.

Çi bi Dengbêjiya me hat?

Ev roj li paş man, çûn, êdî hew tîn... Û bawer bikin wê biranîna wan-rojan kêm mirov bi keser û hesret binin. Ji ber ku ew roj, ne rojên ronî û geş bûn ji bo me, da çavên me li riya wan bigerin... Lê, ew roj çendî reş û tarî û di pêşira xwe de em li mirimê mijandibin jî, gelek tiştên me yê qenc û pak jî di nava xwe de veşartibûn (xef kiribûn), û mixabin ji ber nezanîna me, gelek jî van tiştên me yê giranbûha bi xwe re birin...

Yek ji wan jî dengbêjî bû...  
Ku di wan rojan de hatina dengbêjêkî, li gundan dikir şahî û cejneke bêpayan. Ne axayek, ne begek bûya, kesî nedikaribû dengbêjêkî navdar li xwe bijkira mêvan, û bi rûyekî spî jî bin barê mêvandariya dengbêjêkî navdar derketibûya. Jixwe yê ku axayekî, begekî bi hêz û ji xwe heskirî bûya, her tim di qesr û qonaxên wan de dengbêj hebûn.

Lê dengbêjên hunerxurt û navdar, xwe di gundekî de, di malekê de nedifetisandin; gund bi gund, bajar bi bajar digeriyan. Li aliyekî, çi di xurcîkê wan yê hunerê de hebûya, li dera ku lê dibuhîrîn belav dikirin û li aliyekî din, wekî mîşên hingivîn ku li her kulfîkê dafînîn; çi warê ku lê dibûn mêvan kilam, çirok, bûyer û serpehatiyên wê herêmê berhev dikirin.

Dem a bi sê dengan di tariya şevê de dengê wan bilind dibû; çi gund, çi navçe û çi bajar bûya, ew warê ku deng-

bêj lê mêvan bû, ji zarokên dergûşê heta bigihîje pîr û kalan; hemû kes wê şevê bi dengê kilama dengbêjê hêrs dibûn, şa dibûn, mat dibûn, di kûrahiya evîne de derbas dibûn... Baş-xerab dîroka kurdan jî, di kilamên dengbêjan de veşartiyê.

Celadet Bedirxan di sala 1934'an de ji Şamê tê dengbêjêkî ku di wê deme de navdar bûye angû e Ehmedê Fermañê Kîkî dibe ba xwe û kilamên ku ji devê wî digire û di Hawara de çap dike. Piştî re jî navê Ehmed Fermañê Kîkî dibe dengbêjê Hawarê. Wî hê di wê demê de dîtîye ku çanda kurdî bê dengbêjî nabe. Lê çi heyf ku ronakbîrên sosyalîst ên kurd wekî Celadet jî civaka kurd nenasîne.

Di destpêka şoreşê de, rewşenbîr û şoreşgerên kurdan, rû li dengbêjan badan... Digotin: "Ev çi ye? Bi saetan lo lo û hey lo lo!.. Ev ne huner e, tenê şerê nav eşîran geş-dikin, û bira bi bira didine kuştin!.."

Bi rastî; gel jî bi vê yekê bawer kir û dilê xwe, çavên xwe li dengbêjên xwe girt. Lê ji ber ku ew huner bi hêz û xurt bû, rehên-wê di kûrahiya kurdîyê de veşartî bû, kesî nedikaribû jê bikêşanda, serî jî mirinê re dananî, xwe parast... Lê ji rengê xwe gelek tiştan winda kir.


Ev çend sal in ku ronakbîrên kurdan bala xwe bi ser dengbêjiyê de xwar kirine... Dereng man, lê baş e, ne xerab e...

R. DÎROVAN

CAVDÊR

Nexweşîna li welatên îslamî: Artêş

Sedsala bîstana jî bo welatên îslamî ji her aliyê ve bû kambaxî. Piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn, Împaratoriya Osmanî jî li hev belav bû û li şûna wê bi destê împeryalistên rojavayê, komek dewletên sîvnî hatin avakirin. Ereben ku her tiştê wan yek bû, bûn dewletên jî hev veqetiyayî, li aliyê din kurd jî bûn penc parçe. Tirkên li Asyaya Navîn, li Bâlkanan, li Kafkasên û gelên misilman ên din, di bin esaretê de man. Welatên îslamî bi salan di bin mijokdariya dewletên Rojavahî de man. Dema Rojavahî vekîşiyân, li dewsa xwe îktîdarên ku hemû daxwazên wan wekî emîr pêk dianîn, hiştin. Wan desthilatîyan, li temamên welatên îslamî du xûsûs jî xwe re wekî prensîbên bîngehîn danîn.



ALTAN TAN

1. Rakirina dîne îslamî.
  2. Pêşkêşkirina hemû hêjahiyên sererd û bîner; jî Rojavahîyan re.
- Li hemberî vê yekê tevgerên gel ên muxalîf, bêpayan hatin binpêkirin. Her dengê daxwaza heqê meşrû, hate birîn û rêxistinên sîvil bi tlarê zorê hatin serkûtkirin. Ji bo ku ev rejîm karibe li ser hikum bimîne jî, artêşên ku li gorî yê Rojavahî modern hatibûn avakirin, bi kar anîn.

Ev artêşên li welatên îslamî, liwbaziyên xwe ne ji bo dijminên li der, lê ji bo gelê li hundir pêk anîn. Çi gava ku gel dilnexweşiya xwe ya li hemberî van rejîmên hevkar û algîrên Rojavahîyan anîn zimên; berî hemû kesî li pêşberî xwe ev artêşên rejîmê dîtin.

Çi gava ku rejîm ket talûkeyê, generalan dest danîn ser idarê û rejîma xwe filitandin. Bi salan ev îstîk li Sûrî, Îran, Iraq, Misir û Cezayîrê hat lîstin. Lê belê li Tirkiyeyê serdestiya leşkerî ya li ser idarê jî zû ve ye heye. Ji dema Osmanîyan ve leşker tekildarî karê siyasî bûne û rêberiya siyasîetê kirin.

Komara 1923'yan jî, kadroyên leşkerî ava kir. Ji serokatiya van kadroyan tevî Mûstafa Kemal û İsmet İnönü zahfê wan bi eslê xwe paşayên osmanî bûn: Gava ku îktîdar bi dest xistin, berî hemû tiştî temamê muxalîfan tasfiye kirin. Çi kesên ku wekî wan nedifîkirin, çi tevgerên ku wekî wan nedilivîn li derveyî xwe hiştin û koka wan anîn. Şêx Seîd û 46 hevalbendên wî, ku serhildana herî mezin a olî û neteweyî li dar xistbûn, tev de xeniqandin.

Lêbelê hemû welatên îslamî, bi acizî û nexweşiyên mezin dekilin; gelên misilman li ser hemû aqara îslamî li hemberî van rejîmên li ber xwe didin. Lê wisa dixuye heta ku ev artêşên cebetûd û bê însaf nekevin bin hikmê îktîdarên sîvil, dawî li vî serî nayê. Ji ber van sedemên e ku general naxwazîn MGK rabe û serleşkerî bibe saxeke Parêziya Neteweyî. Çi pêşniyaza ku bibêje bila karê siyasîetê û artêşê jî hev veqete, artêş here welêt li hemberî dijminên derve biparêze, jî bînt qebûl nakin û mora xiyaneta bi welêt re, lê dixin. Bi cinayeten faîlî meçhûl her roj bi dehan însan winda dibin, diçin. Ji bo ku welatên îslamî jî yê rewşa xerab rizgar bibin, divê berî hemû tiştî, artêş bi gelên xwe re li hev bîn.



# Mûzîka kurdî bûye

**M**irovên me hene ku ji ber kirinên wan mirov bi wan şanaz dibe û xwe bi hunerên xwe, ne bi tenê bi me, her wiha ji bîrî me jî xwe dane qebûlkirin. Dilşad Saîd yek ji wan kesan e û di warê muzisyeniyê de gelê me li cîhanê gelek caran bi awayekî serkeftî nîmandiye û rûyê me spî kiriye. Hevalên me DILDAR ŞEKO / DÜZGÜN DENİZ bi kemanîst Dilşad Saîdê Dihokî re, bi nîmîndeyê dengê çiya re. bi riya telefon û faksê ev hevpeyvîna hêja û baikêş pêk anîn.

Roj baş mamosta. Wekî rojnameya Azadiya Welat, em dixwazin hevpeyvînekê digel we bikin.

— Belê, ser seran û ser çavan. Ji bo bersivdana her pirseke we ez amade me. Bifermin...

Hûn dikarin muzîka kurdî ji bo me şirove bikin û di nêrîna we de muzîka kurdî îro di çi warî de ye?

— Li pey şarezahiya min di muzîka rojhilat û ya rojava de, jî bo min xuya bû ku muzîka kurdî pir kevnar e û kesatiya xwe ya taybet heye û her wisa tesîreke eşkere di muzîka cîranan de, bi taybetî li ser muzîka tirkî kiriye. Helbet, jî cîranan jî wergirtiye. Muzîka kurdî, bûye parçeyekî girîng ji jiyana gel a di hemî waran de.

Kaseta we ya bi navê Soran û Baînan li tevahiya Tirkiyeyê bi gelemperî hate belavkirin û çihê dilxweşiya hemû guhdaran bû. Hûn vê yekê çawa dibînin û hûn dê karibin bi kaseta xwe ya duyemîn bersiva guhdaran bidin?

— Belê, sebarek ji bo kaseta enstrûmentalî ya kemanê. Lê sê kasetên din jî bo Tîpa Dihokê min danandine û ew kaset têkel in ji muzîk û stranên yekdeng û pirdeng, mîna Nêrgîz, Hoy

Nazê û Hera Şînî. Sebarek kaseta lêxistina kemanê, ev kaset berî bi çend salan daxwaz û niyaza min û hejmareke zor a guhdaran bû. Her wisa ez pêxweşal im ku kaseta min li Tirkiye û li tevaya Kurdistanê bi sanahîtirin re û bi erzan-tirîn nirxê bê weşandin, da ku hunera nûjen a kurdî bigihîje gişt deveran.

Hûn, bi teknîka muzîka klasîkî stranên kurdî bi reneki nûjen şirove dikin. Ev çawa hat bîra we û we kengî dest pê kir?

— Her ji roja ku min xwendina xwe li peymangeha Bexdayê bi dawî aniyê û piştî baş şarezabûna min di warê muzîka Rojhilat û Rojavayê de û piştî min baş zanî ku muzîkarên Rojava, muzîka welatê xwe bi şeweyekî nûjen çawan spehî û rind bi kar anîne, wekî humer-mendekî kurd min jî xwest ku vê rêkê ji bo xwe bikim rêbaz. Ji lewma kaseta min a nû, ne ku tenha li cem kurdan berkeftî ye, belkî li cem xelkê rojava jî wisa ye.

Mamosta Dilşad, niha rewşa xebata we bi çi rengî ye?


— Li meha adara çûyî, min xwendina xwe ya muzîkî li fakulteya Hox-Şolê li bajarê Salisborgê bi dîmahî anî. Paşê digel vê kasetê û her sê kasetên ku li serî me danî xuyakirin, min li Ewropayê û li Tirkiyeyê weşand. Paşê, min awazên kasetekê ji bo stranên Şivan Perwer afi-



rand ku yekemîn car ev awaz bi şeweyeke nûjen jî-bo stranên kurdî bîn danandin û mawey sê mehan ez xerikî vî karî bûm. Ew kaset, jî heşt stranan pêk hatibû. Lê mixabin ku Şivan, ew kaset şande Tirkiyeyê jî hinekan re destûr da ku bi şeweyeke ticarî-bê-tomarîkirin. Ew kes jî, piştî ku guhdariya muzîka min dikin û didin guhdarîkirin, radibin tîpeke din a muzîkî tînin û dîr jî muzîka ku min danandibû, jî bilî Ya Star û Bêje Heval muzîka tevahiya kasetê diguherînin. Lê mixabin ku navê min li ser kasetê her maye. Tu peywendiya min bi wê kasetê nîn e jî bilî

N avê min Dilşad M. Saîd e. Di sala 1958'an de, li bajarê Dihokê jî dayik bûme. Ji malbateke navhal û jî 8 zarokan yek im. Du zarokên min hene. Vehîn (7) û Arîn (4). Min-xwendina xwe ya destpêkî li bajarê Dihokê temam kir. Di sala 1977'an de, min Peymangeha Hunerên Ciwanî bajarê Bexdayê temam kir. Di sala 1984'an de ez çûme Britanyayê, çar sal û şeş mehan li Zankoya Welzê min xwend-û min bawernameya (diploma) bekeloryos û ya mastêr wergirt. Her wisa min hawernameya hosteyê li ser-kemana klasîkî, jî Royal Academy of Musîkê li bajarê

Min awazên kasetekê ji bo stranên Şivan Perwer afirandin ku yekemîn car ev awaz bi şeweyeke nûjen ji bo stranên kurdî bîn danandin û mawey sê mehan ez xerikî vî karî bûm. Ew kaset, jî heşt stranan pêk hatibû. Lê mixabin ku Şivan, ew kaset şande Tirkiyeyê jî hinekan re destûr da ku bi şeweyeke ticarî-bê-tomarîkirin. Ew kes jî, piştî ku guhdariya muzîka min dikin û didin guhdarîkirin, radibin tîpeke din a muzîkî tînin û dîr jî muzîka ku min danandibû, jî bilî Ya Star û Bêje Heval muzîka tevahiya kasetê diguherînin.



**Ji devê  
Dilşad M. Saîd  
jînenîgariya  
wî**

# parçeyek ji jiyana gel



1 **SORAN BADINAN** *Violin*  
for Violin & Piano **DALSHAD SAID**

*Allegro*

6  
10  
14  
17  
22  
25  
29  
33  
37  
42  
47

*sempre legato*

*P*

wan her du stranên Ya Star û Bêje Heval.

Di encamê de mamosta can, heger bêxwestin, hûn dê konserekê li Stenbolê bidin? Ji aliyê din em spasiya hesta we ya tenik dikin ku we ev derfeta hevpeyvîna da me...

— Ez zor pêxweşal im ku li bajarê Stenbolê ez konserekê pêşkêşî kurd û tirkên bikim. Her wisa ez spasiya we dikim û silavên xwe pêşkêşî xwendevanên Azadiya Welat dikim.

Londonê wergirt. Di navbera salên 1978-1980 û 1989-1991'ê de, ez bûm mamosteyê muzîkê li Peymangeha Mamosteyên Jin li bajarê Dihokê. Di sala 1979'an de, min Tîpa (gurup) Dihokê pêk-anî û ev tîp beşdarî aheng û festîvalan bû û du salan li ser hev, li ser gîşt tîpên Iraqî, tîpa me yekemîn derket. Di sala 1980'an de, ez bûm alîkarê Îzge (radyo) û televîzyona Bexdayê û her di wê demê de ez di tîpa senfoniya Iraqê de bûm lîderê kemanê yê yekemîn. Di sala 1991'ê de jî, li ser vexendnameya Akademiya Berlînê, jî bo sê mehên ez çûme Almanyayê. Nihê jî ez mamosteyê muzîkê me li Awusturyayê.

**Piştî min baş zanî ku muzîkarên rojava, muzîka welatê xwe bi şeweyekî nûjen çawan spehî û rind bi kar anîne, wek hunermendekî kurd min jî xwest ku vê rêkê bo xwe bikim rêbaz. Ji lewma kaseta min a nû, ne ku tenha li cem kurdan serkeftî ye, belkû li cem xelkê rojava jî wisa ye.**

## Pêlikên notayî yên strana "Sorana û Badînan"

Beşê yekê, strana "Hoy zeri zeri" ye. Beşê duwemîn, "Kurdistan" e.

Kurdistan şarî şerîn im  
Şarî ciwan û kurd nişîn im  
Ya Xwa, qet lê dûr nemîn im  
Xoş im le wê niştîman im.  
Xoş im le wê niştîman im  
Hêzî dil, aramî giyan im ey wey wey  
Ronakî rêgay jîyan im.

Kurdistan cigey ecdad im  
Cigey Şirîn û Ferhad im  
Ya Xwa qet neçey le yad im  
Xoş im le wê niştîman im.  
Xoş im le wê niştîman im,  
Hêzî dil, aramî giyan im ey wey wey  
Ronakî rêgay jîyan im.



# Piştî hijdeh salan dîsa **Cegerxwîn**



Cegerxwîn (Şexmûs Hesên) 1903-1984

AYNUR BOZKURT

**D**axwaza her hunermendên mezin ew e ku hunerên wan ji aliyê gelek însanan ve bêne ecibandin û ne tenê xitabî gelê xwe, xitabî gelên din jî bike. Hunermendên ku armanca wan ev be, ew jî li dinyayê cihê xwe yî birîmet û navneteweyî distînin. Jixwe heke li gorî gerekên hunerê mirov bipirxîne, însan bixwe hêmana sereta ya (unsur) hunerê ye, her wiha afirînerê hunerê jî însan e. Xema hunermendan divê ew be ku, her tim hunera xwe bixwe bin xizmeta însanan û bi hunera xwe li ber pêşketina civakan nebe asteng, divê rola xwe ya pêşvertûyê baş bi kar bîne.

Li ser vê yekê mirov dikare helbestvanê nemir Cegerxwîn nîşan bide. Ew jî roja ku dest bi xwendin û nivisandinê dike, beta mirinê jî bo gelê xwe û dost û biratiya gelên dinyayê xebitiye, helbestên xwe jî bi vê armanca nivisandinê. Taybetiyekê wî ya herî muhîm jî ew e ku her tim kurdûna xwe parastîye, lê ev jî bo

wî nebûye sebab ku nijadperestiyê bike. Ji ber vê yekê Cegerxwîn minakeke gelek girîng e hem ji bo hunermendên kurdan, hem jî ji bo mîletê din.

## HUNERÊN TALANKIRÎ

Mijarâ me ya rastin li ser pirtûkeke Cegerxwîn e: **ŞÎRÊN WINDABÛYÎ**. Ev pirtûk wê di nêzik de di nav Weşanxaneyê Avesta de derkeve piyaseyê. Esas Cegerxwîn ev helbestên xwe jî bo dîwana xwe ya 4'an (Ronak) nivîsiye, lê ji ber tengasiyên wê demê ev helbest nakevin dîwana 4'an (Ronak) û wî wîndî jî dibin. Mirov jî Fener Rojbiyanî yê ku van helbestan di de weşanxaneyê çiroka windabûyîna helbestan hîn dihe: "Rojekê (meha Gulana 1985) ez û hevalekî xwe jî bo bêhnvedanê derketin derve û çûn taxeke bajara Helebê.... Li wir em ketin mala kurdekî ji Efrînê û di navbera me de danasinek çêbû.... Pişt re em derbasî pîrsa li ser zimanê kurdî, zaravayên wî û çawaniya pêkanîna yekîtiya zimên bûn.

Di wê demê de kurê Xalê Mûs jî nav pirtûkgeha xwe ya tay-

## XATIRXWESTIN ÇIQAS ZOR E

*Gelo ezê b'zimanê kê ji şerîne xatir b'xwazim?  
Ezê destê kê dirêj kam destê wê, ku xatir b'xwazim?  
Ezê jê dûr kevim îro, eger b'xwazim, ger nexwazim*

*Çiqasî dûrketin tal e ji ber b'ku de ezê bibazim?  
Çiqas xatirxwestin zor e, lê zortir xatir nexwazim  
Ne dil karî, ne ez karim, ne karin: Zar û awazim*

*Li ber çavê min î her gav, wekî bilbil e ranazim  
Ji min ku dûr kevi dîlber.. gelo çawa ezê razim?*

*Meger rast e d' evîne de çeleng siwar im, hinerbaz im  
Belê ku dûr ketim zihar.. şev û rojan ezê b'gazim  
Ji bîr nabî tu ey Ronak, ji bîr nebim, ji te dixwazim  
Wekî Goyîn li ser şaxa.. pel û kata.. bi gaz gaz im*

*Bila dûrî, bi rûreş bî çiqas b'westim dihevraz im  
Li pey wê: Dîlîn û şahîn, ew nêçir e lê ez baz im*

*Çiqas pelên evîn kûr bin.. ez î wek qumpî û qaz im  
Tu ristvan û hinermend î.. ji ter peyxam û hemsaz im  
Dêmên gulî, çavên belek, li ber çav in gava d'razim*

*Eger Ronak li ser soz bî, felek yar bî, ezê bixwazim.  
Du sê qedeh, tu meygêr bî.. li ber dengê te ê ez im  
Di nêv destên te, bî çavên te, ez himrim û tîr razim.*

Helbestek ji pirtûka "Şîrên Windabûyî"

bet gelek kitêbên kurdî yê klasîkên me, mîna yê Celadet û Kamûran Bedirxan, Osman Sebri, Qadirçan, Cegerxwîn û çend hejmar ji orjînalên Kovara Hawarê, li gef bi dehan nivîsên bi dakîloyê jî qesîde û helbestên Cegerxwîn dan min.

Kurê Xalê Mûs jî min re çiroka van destnivîsan anî zimên ku, rehmetî Cegerxwîn di jiyana xwe de ber bi Beyrûdê diçe, bi mebesta çapkirina dîwana çaran (Ronak), riya xwe bi mala Xalê Mûs jî dihe. Xalê Mûs dostê Cegerxwîn yê komunist yê li Sûriyê û li Kurdistanê Sûriyê bû. Ji ber hin sedemên giştî, niyeta çapkirina Ronakê hate guhertin, êdî wî dixwest ku berê xwe bide Ewrûpayê (Swêdê). Pişt re dîwana çarem li Swêdê hate çapkirin û ev beş jê mabû. Kurê Xalê Mûs van nivîsan dîyarî min kir û got "Divê tu qîmeta van rûpelan bîzanîbî û vî emanetî bigihîni dawiyê."

Rojbiyanî dewamî dike: "Li Ewrûpayê min bihîst ku herdu kurên Cegerxwîn Keyo û Azad li ser xebateke giranbuha sekinîne û eserên bavê xwe kom dikin.... Lewre jî min xwest ku ez bi Keyo an jî bi Azad re têkevim tîkiliyan. Lê sed mixabin ev merem negihîste serî, ji ber ku ez di sala 1993'yan de hatim girtin û ji ber kurdewariyê xwe, derbasî zindana tarî bûm. Dema ez di girûgehê de dimam, zilamên îstixbarata Sûriyê êrişî mal kirine û serûbin kirine û destê xwe danîne ser pirtûkgeha taybetî ya min. Wê demê sed heyf ku heşeke bi nîrx ji nivîsên Cegerxwîn; nemaze (bi taybetî) wergera kurdî ya Çarînen Omer Xeyam û Nameyên ji helbestvanê faris ê mezin Fîrdewsî û gelek helbestên din di wan de hebûn.... Nihâ min ev emanet a buha, tevî berpirsiya ku min ji kurê Xalê Mûs dewr girtûbû, ji stûyê xwe derxistîye û min xistiye stûyê Weşanxaneyê Avesta...."

Belê, heke em binekî li ser vê bûyerê bifikirin, emê bibînin ku berhemên kurdan çawa tene talankirin. Eger helbestên di vê pirtûkê de jî xelâs nebûna, ne me dikaribû serpehatiya berhemên Cegerxwîn ên ku nehatine çapkirin hîn bibin, ne jî, berhemêke wisa wê di destê me de hebûya. Eger çav bûyer li welatekî din biqewimiya; wê dinyayê bibihîsta. Kî di cihê sazîyên çandî yê kurdan de bûya wê bi tîkiliyên navneteweyî bi ser meseleyê ve biçûna û wê jî bo berhemên ku îstixbarata neyaran dest daniye serê, hesab ji wan bixwesta.



ŞEFİK BEYAZ

**ENSTÎTUYA KURDÎ** ya Stenbolê şahiyekpêk ani. Şahî roja 4'ê rêbenda-nê li Restorana Karîdesê ya li Kumkapiya Stenbolê çêbû. Li seriya hezarî, kes beşdarî wê şahiyê bûn. Gelek kes jî, ji ber nebûna cih bi şûn ve zivîrîn.

Şahiyê bi axaftina Serokê Enstîtuyê Şefik Beyaz dest pê kir. Beyaz, di axaftina xwe de li ser girîngiya saziyên çandî rawestîya û daxuyand ku têkoşîna çandî bi ya siyasî neyê destekkirin, bi ser nakeve.

Ûyaz da zanîn ku, ji bo geşedana çand û hunera neteweyî desthilatiya siyasî pêwîst e.

Nivîskar Altan Tan jî di şahiyê de axaftinek kir. Tan çand û ziman jî aliyê îslamî ve şîrove kir û bi ayeteke ji Quranê bi bir xist ku, qedexekirina zimane-kî dûrî prensîbên îslamê ye. Here wiha Altan Tan eşkere kir ku demokrasî jî tiştekî wiha napejirîne.

Di şahiyê de kesên wekî ebûqat / nivîskar Tarîk Ziya Ekîncî, nivîskar Edîp

Polat û Feqe Huseyn Sağıncî jî axivîn.

Edîp Polat li ser pêwîstiya avakirina yekîtiya nivîskarên kurd rawestîya. Polat diyar kir ku pêwîst e nivîskarên kurd, ne rewşên bir, li Tirkîyeyê yekîtiya xwe ava bikin û têkoşîna xwe li ser axa xwe bidin.

Kesên wekî Ragîp û Aysel Zarakolu, Zübeyde û İshak Tepe, Kemal Parlak, İsmet Ateş Kemal û Leyla Peköz, Fehim Yüksel, Selim Okçuoğlu, Nuredin Qerecadax, Kamber Soypak, Burhan Erdem, Abdullah Keskin, Süleyman Çelik, Ay-nur Bozkurt tevî şahiyê bûn.

Ji aliyê din ve sazî û şexs bi mesajên xwe jî bo enstîtuyê û xebatên li ser çand, dîrok û hunera kurdî, piştigirîya xwe dan nişan.

Komên muzîkê yê Navenda Çanda Mezopotamya mîna Koma Gulên Xerzan û Koma Amed nîmûnayan jî muzîka kurdî ya folklorîk û nûjen pêşkêş beş-daran kirin û bi stranên xwe ew rakirin dilanê.

## RÛDAN

### 'Emê kurdan asîmîle bikin'


**W**eşanxaneyê ku pirtûka Cegerxwîn a bi navê Şîrên Windabûyî çap kiriye ev du-sê meh e ku ava bûye û bi çapkirina pirtûkên kurdî dest bi kar kiriye. Li ser vê yekê Berpirsiyarê Weşanxaneyê Avesta Abdullah Keskin wiha dibêje: "Nêzîkî 3-4 sal e em difikirin ku weşanxaneyê wisa ava bikin, lê ji ber bêmkanîyê me rê nedît. Armanca me ya herî mezin bi kitêbên kurdî destpêkirin bû. Heta vêga tu weşanxaneyên ku li ser kurdan kitêb çap kirine, ne li ser vê armancê vebûne. Dibêjin karekî bi rîsk e, wê neyê firotin. Em jî tam berevajiyê wê dibêjin. Weşanxaneyên wezîfeya xwe, mîsyona xwe neanîne cih. Ta îro weşanxane tev li ser hev, incax 20-30 kitêbên kurdî weşandine, wan kitêban jî mirov nikare bixê kategoriyekê. Ne roman in, ne çîrok in, ne tu tişt in."

Abdullah Keskin dibêje ku li gorî îstatîstîka 88'an, li Tirkîyeyê salê 7 hezar kitêb derdikevin, vêga jî ev reqem bûye nêzîkî 10 hezar; piştî 92'an û heta îro 5-6 kitêbên bi kurdî derketine li Tirkîyeyê. Ji aliyê din ve jî ew îdia dike ku di nava 2-3 salan de, ji kitêbên wan, yek hebe jî neyê firotin, ewê dîsa jî bigihîjin reqema kitêbên ku heta vêga bi kurdî hatine çapkirin. Abdullah Keskin zehmetiyên vî karî jî tîne zimên û dibêje: "Pêşî ji aliyê madî ve divê mirov xurt be. Ne wisa be zehmet e. Lê ev nayê wê maneyê ku meşandina vî karî nemumkun e. İhtiyaciya kurdî bi vê xebatê heye, sibe dusibe wê ihtiyac zêdetir bibe. Ji ber vê yekê çî ji dest me bê emê bikin. Me xwest ku bi vê xebatê balê bikişînin kesên ku bi vî karî re eleqeder dibin. Ev kar ne bi qasî ku ew difikirin zehmet e. Lê ne ewqas zor, ne karekî hêsan e jî."

Li gorî ku A. Keskin dibêje di Weşanxaneyê Avesta de wê berhemên bi telif derkevin. Pêwîstiya pirtûkên wergerê jî tîne zimên, lê dibêje: "Yekî alman an jî, ji miletekî din yekî ku bi kurdî dizane û bixwaze pirtûkên kurdî bixwîne, divê mirov bikaribe berhemên bitelif ên kurdan bide destê wî."

Weşanxaneyê Avesta heta vêga helbestên Şêrko Bêkes "Ji Nav Şîrên Min", romana Mehmet Uzun "Bîra Qederê" derxistine. Di rojên pêş de jî difikirin ku helbestên Reşîdê Kurd, destana Memê Alan, Bîranîna Surme Xanim (Suryanî ye) derxin. Abdullah Keskin jî bo Reşîdê Kurd, "Eger wî helbestên xwe ne bi zimanê kurdî, bi zimaneke din binivîsanda, ez bawer dikim ku wê navê wî, di ansiklopediyên dinyayê de cih bigirta" dibêjin.

Li ser pîrsa me ya, hûn difikirin ku bi zaravayên kurdî yê din jî pirtûkan çap bikin, bersiva "Na. Em vêga nafikirin. Muheqeq divê ew jî derkevin, lê ji ber ku em vêga hem jî zaravayên din



Gerinendeyê Weşanxaneyê Avestayê Abdullah Keskin


fêmanakin û hem jî nikarin binirxînin. Dema mirov karekî bike divê pêşî bifikirin ku çî kiriye û çî daye. Feqet di rojên pêş de em difikirin ku pirtûkên bi tirkî yê hêja jî çap bikin. Tabî ev ne karê me ye yekemîn e, wê pirtûkên kurdî zêdetir bin. Li aliyê din em dixwazin berhemên bikalîte çap bikin. Yanî ji bo me şexs an jî naverok ne muhîm e. Mesela Ezra Pound bi dîtina xwe însanekî faşîst e. Dîtina İsmet Özel îslamî ye. Lê helbestên wan gelekî baş in. Eger îmkan me hebe emê wan berhemên jî wergerînin kurdî. Naveroka berhemên li ser eşqê be, li ser şer be, an jî xebateke ferdî be, ew jî bo me ne muhîm e. A muhîm, ew e ku çawa hatine nivîsandin. Çûnkî çêsnê herî dewlemend edebiyat e. Edebiyat jî aliyê naverokê ve bêsînor e. Feqet ziman, taswîr, îmajînyasyon, diyalog, usûl û hwd. divê hêjayî çapkirinê bin."

Wek gotina dawî Abdullah Keskin vê dibêje: "Em dixwazin kurdan bi kurdî asîmîle bikin. Vêga kurd ne kurd in li gorî min. Çûnkî îro tu ferqa gundeyekî tirk ê ji Çorumê û kurdekî ji Kurdistanê nîn e. Kurdan bi her awayî xwestine xwe bişibînin tirkan. Lê belê ev tu car nemumkun e. Çawa hedefa têkoşîna neteweyî jî afirandina jiyaneke nû ye. Wekî ku serokatiya kurdan jî dibêje: "Em dixwazin jineke xweşik û mêrekî xweşik biafirînin", em jî dixwazin bi xebatên xwe alîkariya wê fikrê bikin."

## TÎŞK

### Minareyêkî bejinzirav

**X**wenerî azîz û dilovan im, lat rûn û aşkira ye ke, ta halî hazir, zor şitî corawcor le ser MED TV, nûsran û pir kesan boçûnî xoyan be raşikawî xiste rû. Xo her le dû tiwêy laperekanî rojnameyekan da, gelê şitî cêreng it le sitayîş û şanaziyewe bigre, ta degate rexne û (qisey reqîş) hebûn. Belam pirsîyarî mebest ke min dexwazim, le hemwanî bikem, ewe ye. Aya sercemî ew nûsîrane, be çawpoşîn le hendêkyan, şitêkî be sûdyan be telefîzyon beşîl? Hez dekem min bersivî ew pirsîyare nedemewe û êwey hêja bo xotan le welamdanewey da, serpişik bin. Min wa lew nûsîrane derwan im, ke



SÎRWAN REHÎM

leylayey na corî minalêkî sawa bûn û le birî ewey ew sawa ye dilaram biken û be hêminî witey mebestî be gwê da biçirpênin, şitî na cor û helgirtinî gaberdiyan lê xwastuwe. Aşkira ye ême hîç le hunerî telefîzyon nazaînin, çûnke eger biman zanya ye, rûy ew hemû tekîlfîman le MED TV ne dena. Reng bê bilên bo!? Ê

xizmîne wa ye, xo MED TV, xawenî erşîfêkî 20-30 saley berhemî kurdî niye. Xo wekî erşîf niye, çîwar pênc kompaniyay berhem hênanîşî le piştewe nîn e. MED TV le sifîrewê destî pê kirduwe.

MED TV, yekem hengaw e, belam hengawî dilniyayî. Le sayey em deng da, le veresî em renge da, yekem care le lûtkeyek da, westawîn û tewawî dewrûberman lêwe diyar e. Yekem car e, lem minare bejinzirawewe bangêk dedeyin ke, her çîwar lay awayî mebestman deqrête amêz. Em lûtke ye be hîç girdoleyek ra, berawird nakrêt, ca le helsegandinî da, be însaf bîn çak tir e.

Diyar e, emane hemû û zor şitî tirîş, waman lê naken ke çaw le hele û kemasiyekan bipoşîn û xomanyan lê ladeyin. Min dezanim û be dilniyayewe amaje be kem û kûrriyekan dekem. Çûnke wekî pêştirîş witim, hem em kare yekem hengaw e û hengawêkî sextîş. Hemîş, kemasiyekanî MED TV kemasî rûxsarî girawî sercem gelî kurd e û her hemû tîy derwanin, ke wisa bê min natwanim lêyan bişarmewe û ew mebestişim niye. Belam (qîmetî eşya be cêge ye) min way debînim, ew (eşyayane) le serçaweyek ewe, ser heldegrin ke sêberî hîç ejdîhayekî be serwe niye, her boye pêwîst e û divê lem mijareman da, be derbasttir le mijarekanî tirman beaxivîn. Xo aşkîraş e, lem boçûneman da, hergîz mebestman ewe niye, MED TV bibêt bew taqane çemûşey ke xêr nedatewe û le ciwanî û çakî da, darêkî zir bêt. Nexêr wa nalêyin û waman mebest niye.



# Xwedê!

## Heqê te li me nema!..

**D**i qijêna kelegerma çilê havînê de bi dengêkî kezepqetên diqirê: Xwedê!..Heqê te li me nema!..Hêdî hêdî dimeşiya, her du destên xwe hildidan û bi hev re li her du çîpên (teştên) xwe didan û diqirîya:

- Xwedê!..Heqê te li me nema!..

Bejna wî dirêj bû. Porspî bû. Şêst salî tê hebû. Bêhal mabû. Destên xwe dikirin kûlm ber bi jor ve raberê Xwedê dikirin (li ba wî, ew li jor bû) û diqirîya:

-Xwedê! Heqê te li me nema!..

Kî bû? Ji kê bû, ji ku dihat, ku de diçû?

Derdê wî çi bû? Tu kesî pê nedizanî. Tu Kesî ew nedinasî. Kinc cilên wî peritbûn. Sing û berî-bedenên wî ji bevkêfî bûn. Serê xwe bilind dikir, paş de diavêt, rûyê xwe li asîmanan rast dikir, kûlmên xwe bijor ve hildidan û diqirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Pêxwas bû, her du piyên wî heta pêçiyên (tiliyan) ji xwînê sor bûbûn. Dev-rû û ser-çavên wî di nav xwîn û kef û gilêzê de mabûn. Çavên wî mîna du piloqtên agir dipijiqîn, rondikên wî ziwa bûbûn û diqirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Dasterê diçû, li doralên xwe fen nedikir, li tu derî nedinerî û tu tişt nediditîn. Di xwidanê de werbûbû. Hilm nedistand, bêhna xwe venedikir û hema diqirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Hinek ji zar û zilam û xort û efendî û tolazên bajêr bi pey ketin demekê. Hinekan pêşiya wî birin, pirs jê kirin, wî pakî ji kesekî nekir û berê xwe neda wan, riya xwe ji ser wan guhart û beyî ku navber bide diqirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!.. Sûk bi sûk,

kolan bi kolan, derî bi derî geriya. Hemû der û deverên bajêr dan bin piyên xwe yên xwas û xwînbûyî, li tu cihan nesekinî, rawest neda.

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Dikandar derdiketin ber dikanên xwe, malî ji malên xwe derdiketin derve, bi balkêşî-bi meraq lê dinêrîn û ji hev dipirsîn: "Gelo, çi bela vî rebenî ye?" Kesekî tu bersiv ji tu kesî nedistand. Wî ne li paş, ne li pêşiya xwe dinerî.

Jinina, zilamina xwestin avê vexwe. Av ber bi devê wî kirin. Wî berê xwe wê de dida. Bi kezebên hişkbûyî, bi lêvên ziwa diqirîya!

-Xwedê! Heqê te li me nema!..

Bû esir, êvar ser de bat. Xelkê bajêr bi malên xwe ketin, sifrên xwe danîn, şivên xwe xwarin, seyra televîzyonên xwe kirin, dûv re mêr derketin derve, li çayxanayan rûniştin, çêla (behsa) vî kalê belengaz kirin û ew li serê kolaneke bajêr diqirîya

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Hinekên bi gundan re dan û standina wan heyî ji hinekên pirsker re di sohbeta çayxanayan de gotin:

-Ev zilam Gijalî ye. Navê wî Sofî Brahîm e. Sofî Brahîmê Gijalî. Du kur û keçek û sê neviyên wî hebûn. Lawê wî yê biçûk niha leşker

e li Sarikamişê. Ew û lawê xwe tev de welat-parêz in. Lawê wî yê mezin Loqman ev çend car in tê girtin û berdan. Dibêjin milisekî partiyê ye. Ev heftiyek bû Lokman piştî sal û nîvekê ji hepsa Diyarbekirê hatibû berdan. Berî du şevan kontrgerîla di ser mala wî de girtin. Bi çekên giran, bombe û bazûqeyan avêtin ser mala wî. Xaniyê wan hilweşiya û agir pê ket. Erz û eyalên wî tev de mirin. Wê êvarê Sofî Brahîm ji çûbû Sivikê. Hecî Nûrî Axa, axayê Sivikê cewab şandibû jê re ku dixwaze wî bibîne. Bi vî awayî ew bi tenê ji mirinê filitî. Ew û lawê wî yê li Sariqamişê esker, Sofî Brahîm çawa ku li Sivikê ev bûyer bihist, beziya bate gund. Hate

**Ev heftiyek bû Lokman piştî sal û nîvekê ji hepsa Diyarbekirê hatibû berdan. Berî du şevan kontrgerîla di ser mala wî de girtin. Bi çekên giran, bombe û bazûqeyan avêtin ser mala wî. Xaniyê wan hilweşiya û agir pê ket. Erz û eyalên wî tev de mirin. Wê êvarê Sofî Brahîm ji çûbû Sivikê. Hecî Nûrî Axa, axayê Sivikê cewab şandibû jê re ku dixwaze wî bibîne. Bi vî awayî ew bi tenê ji mirinê filitî. Ew û lawê wî yê li Sariqamişê esker Sofî Brahîm çawa ku li Sivikê ev bûyer bihist, beziya hate gund. Hate gund ku heylo û heylo, çi bibîne... Wê gavê de ne hiş ma. Eql û sewda ji mejiyê wî firîn. Li dor kavilê xaniyê xwe dizivirî, xwe hildavêt û bi carekê dest bi qêrînê kir:**

gund ku beylo û heylo, çi bibîne... Wê gavê de nehiş ma. Eql û sewda ji mejiyê wî firîn. Li dor kavilê xaniyê xwe dizivirî, xwe hildavêt û bi carekê dest bi qêrînê kir:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Çend fetil li dora gund avêtin û diqirîya.

Dûv re, wê nîveşevê bi çolan ket. Çol bi çol, deşt bi deşt, gund bi gund geriya û diqirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Çû Sivikê, ji wir Xirabêtûyan, Dikê,

Zengilok, Pêlîsiyê, Bêdarê Omêrînê, Gûzikê, Nêhrîbê, Cinîbrê, Batil û Qavilqirê, Fehmîkê û dawiyê xwe di Eyntîrbê re berda kuçên bajêr. Li tu derî nerawesta, hedara wî li tu deveran nedihat û diqirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Tarîstana şevê stûr bûbû. Xelkê bajêr hilkêşan ser textên xwe. Ketin nav cih-nivînên xwe. Bi xew ve çûn, xewn dîtin. Ew diqirîya:

-Xwedê! Heqê te li me nema!..

Li kolanan tinawir neman. Niha, vê berbangasibehê dengê wî ji çar alî, ji heft taxên bajêr derdiket ji Çemê Cuhîyan, ji Sinefisê, ji Banê Cîrf, Sîmeykê, Kahniya Qesaran, ji çeman, ji çaryanê, ji ser pirê. Êdî bajar xilas kiribû. Li wî aliyê bajêr tu qozîyeke lê negerîyayî, lê neqîrayî nehêlabû. Vêca wê biçûya wî aliyê bajêr, aliyê Şikeptan, ji wir de berê xwe bida gundine û bajarine din û de biqirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Dabû ser pirê, pira ser Dijleyê. Pir, bajêr ji nivî re dike du seq. Li wî aliyê pirê qereqolek ya eskerî hebû. esker, özel fîm, Korucî, panzêr, kariyêr û topan kemîn danibûn. Sofî Brahîm gihîştê nivê pirê. Di bin projektor û lempên pîronahiyên pirê de diqirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Ji nişka ve bû teqereqa keleşkof û mîtraloyoz û G-3 an.

- Teq, teq, teq, tereqqq!

- Qij, Qij, Qij, Qijijj!

- Gur, gurr, gurr!..

Û vîze-vîza berikan bû, li ser serê wî difirîyan, di laşê wî de cih ji xwe re vedikirin. Sofî Brahîm cara dawî bi dengêkî nizim, bi dengêkî, şikestî û bê awaz dîsa qirîya:

- Xwedê, heqê te li me nema!..

Bi vîneke (îrade) xurt bedena xwe hinekî ragirt, nehişt li erdê bikeve, pêşîra xwe di ser hêta hesinên pirê de berda. Bêcan ma, ji xwe ew jî bi rojan bû, li vê digeriya.

Piştî demekê ku tu pêjn û deng ji Sofî Brahîm derneketin, kemîndarên xiniz ji korçalên xwe derketin, bû vîre-vîra cîb û kariyer û panzeran. Hatî li cendekê wî nihêrîn. Xwîna wî li ser besin û betonên pirê weribû. Dest û milên xinizan bi çekan lêmişt bû. Yek bi yek sixêf kirine cendekê Sofî:

- Morik terörist, sonunu gördün mü? (teröristê virîqî, te dawîya xwe dît?) Komutanê wan emir da:

- Atın gitsin bu yaşlı köpeği. Köprüden aşağı atın. cehenneme kadar gitsin.

(Vî kuçikê kal bavêjîn. Di pirê de bavêjin! Bila, heya dogehê here.) Çend kesan ji wan bi hev re destên xwe avêtin çepilên Sofî Brahîm ser berjêr kirin, bi piyên wî girtin, di ser hêsînen pirê re ber bi jêr de dahelandin û ji bilindahiya sî û şeşmetrên pirê avêtin ava Dicleyê.

Sibehê rojname, radyo û TV'yên tirkîyan wiha gotin:

"Dün gece saat 01.00 sıralarında Şırnak'ın Cizre ilçesi Dicle köprüsü üzerinde bir grup teröristle karşılaşan güvenlik güçlerinin "Dur" ihtarına karşı ateşle karşılık verilmesi üzerine çıkan çatışmada bir terörist ölü ele geçirilmek üzere iken Dicle köprüsünden atılarak intihar etmiştir. Tüm aramalara rağmen teröristin cesedi bulunamamıştır. Diğer teröristler gece karanlığından yararlanarak izlerini kaybettirmişlerdir"

(Şeva berê seet 01.00 (yekê) li navçeya Cizîrê hêzên me yê ewleyî rastî komek terörist hatine. Di navbera wan de pevçûn derketiye. Hêzên ewleyî teröristek birîndar kirine, lê, wî ji bo ku bi dest nekeve xwe di pirê de avêtîye. Hevalên wî yê din jî di tarîtiya şevê de xwe wînda kirine û me tu şopa wan nedîtiye.)

Belê Sofî Brahîmê Gijalî kuştin û cendekê wî bi çemê Dicleyê xistin. Pêncî-şêst berik li laşê wî ketibûn. Çemê boş ê Dijleyê ew stand, hemêz kir. Rûyê wî, nav-çavê wî, rih û porê wî yê di nav xwîn û kef û gilêzê de mayî, şuşt. Xwîdana wî paqij kir. Lêvên wî yê ziwabûyîn, kezeb û qirika wî ya hişkbûyî şil kir, ew têr av kir.

Jê re bû dergûşeke avîn, mîna mindalekî nû ji dayik bûyî ew hedi hêdî hejand, bi pêl pêlokên xwe jê re lorî lorî gotin. Bû hevalê wî, hevreyê wî. Ew awaza wî ya di nav her du lêvên wî de bêdeng mayî vegirt û li şûna wî qirîya:

Xwedê!.. Heqê te li me nema!..

Wekî, Dicle ji Cizîrê derbas dibe, tixûbiyê dike ji Tirkiye û Sûriyeyê re. Dijleyê, cendekê Sofî Brahîmê Gijalî bir tixûbê sûrî, bi Kurdên sûrî gihand. Li wê derê rowê (rûbarê) Nêrdûş ku; ji bilindahiya kopelên Cûdî derdikeve ew jî bi Dijleyê digihe. Her duwan silav li kurdên sûrî kirin, ji dêla xwe û ji dêla Sofî Brahîmê Gijalî ve, û ji dêla kurdên Qamişlokê, ên Dêrikê, Tirbespiyê, ên Amûdê, Hesicê, Efrînê û ji dêla kurdên Şam û Helebê ve qirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Dijle qederê sî kilometreyên din bi çemê Hêzil digihe, ava Hêzil û Dijle tevîhev dibin. Ji wê û pê ve tixûbên Tirkî, Sûrî û Iraqê tînin pê. Çemê Dicle û Hêzil bi hev û din re ji dêla Sofî Brahîmê Gijalî, ji dêla xwe, ji dêla çiyayê Bêxêr û gerilayên li wê, ji dêla Ziyareta Xelî İbrahîm, ji dêla Kurdên Zaxo, ên Kernê, Bamerlê, Bawemê, ên li heşt taxên Bexda, ên Diyala, ên Helepçe, Sersing, Gilale, Hewlêr û ji dêla kurdên Mûsil ve qerîyan;

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Dicle dûv re bi ava Feratê digihe. Her du çemên ji kûrahiya hinavê Kurdistanê dizên, li wir dibin yek û navê wan dibe Şettûl-Ereb. (Çima ne Şettûl-Ekvaq gelo? Çi bikim de bila Şittûl-Ereb be.) Şettûl-Ereb ji dêla Sofî Brahîmê Gijalî ve qirîya:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Avên Kurdistanê tev bi hev gihiya bûn, di çûne Xelîc-ûl Faris. Xelîc-ûl Faris ji dêla kurdên Benderbas, Bendersahpûr, ji dêla kurdên Tehran, Tebrîz, Kîrmanşah, ji dêla kurdên Mehabad, ji dêla şehîdên meydana Çiwarçîra, ji dêla Qadî Mihemed, ji dêla Hejar, ji dêla Pîremerd, ji dêla Goran û ji dêla heşt milyon kurdên Îranê ve qirîya:

-Xwedê! Heqê te li me nema!..

Xelîç-ûl Faris tevî zeryayan, behr û okyanûsan dibe û bi bêdawîtiyên gëtiyê (dinyayê) digihe. Behr û okyanûsên bêmedawî, tevî gol, golav û çemên Kurdistanê, Zeryayê reş ê Sorik bi hev û din re qirîyan:

- Xwedê! Heqê te li me nema!..

Behr, bej, ber, ewr û deşt, newal, girik, çiya zevî û gund, bajar û erd û asîmanan tevan bi hev û din re qirîyan:

-Xwedê, heqê te li me nema!.. Birq û birîsk peqîyan û dûv re gëfî bêdeng ma.

EMÎNÊ TERZÎ



## Sextekariya di warê muzîka kurdî de

# “Hinek dîkin hinek dixwin!..”

**Wekî ku zilm û zora dewletê ku li ser çand, huner û zimanê kurdî ye, ne bes be; berhemên kurdî, bi taybetî kasetên kurdî bi korsanî (bêdestûr) tên belavkirin. Hunermendên kurd mîna Ciwan Haco û Şivan Perwer, ku kasetên wan zêde tên firotin, ji aliyên hinekan ve bi korsanî tên belavkirin. Ne yê wan tenê, kasetên gelek hunermendên kurd bi vî rengî tên belavkirin. Û tiştê herî xerîb û balkêş ew e, ku li ser kaseta Ciwan Haco, ya bi navê “Çaw Bella” ev hatiye nivisandin: “Kopîkirina berhemên vê kasetê qedexe ye” Hûn dibînin ku dizê vî welatî çendî rûçiriyayî ne! Diz dibêjin dizî qedexe ye!... Navê stranên jî bi temamî xelet hatiye nivisandin.**

**Di cihê “Li hev hatiye” de “Lemhatya”, di cihê “Pêjna te nayê” de “Bejna te nayê” û di cihê “Ez xortekî ciwan bûm” de jî “Xorta cinan bu” hatiye nivisandin. Dibe ku hûn bibêjin, “Ma we aqilê xwe xwariye, ku hûn ji dizan têkûz nivisîna kurdî hêvî dikin? Rast e, di vî mirovê vî yekê jî wan hêvî neke, lê dema me ew meroz kirin û em li wan geriyên, me dît ku diz bi xwe jî “hunermede kurd” e. Belkî we navên wan bihîstibe, heta îro bi navê “Zozan û Welat” çar kasetên wan ên bi kurdî derketine. Welat (Yavuz Çapan) dev jî “hunermendiyê” berdaye û dest bi korsaniya kasetên kurdî kiriye. Şirkê wî yê vî kerî jî, yekî bi navê Mehmet Bozan Artıkboğa ye. Li ser kasetê navnîşaneke xeyalî danîne.**

**Me jî Ciwan Haco pîrsa “Haya we, ji belavkirina kasetên we yê bi korsanî heye an na? Û dîtina we li ser vî çî ye?” kir, wiha bersiv da:**

**–Ez pê nehesiyabûm, vêga hîn bûm... Ezê çî bibêjim? Ev tiştê gelek bêexlaqî ye. Hûn dibêjin yê ku ev kiriye jî hunermendekî kurd e, ew ne**



**W**ekî ku zilm û zora dewletê ya li ser çand, huner û zimanê kurdî ye, ne bes be; berhemên kurdî, bi taybetî kasetên kurdî bi korsanî (bêdestûr) tên belavkirin. Hunermendên kurd mîna Ciwan Haco û Şivan Perwer, ku kasetên wan zêde tên firotin, ji aliyên hinekan ve bi korsanî tên belavkirin. Ne yê wan tenê, kasetên gelek hunermendên kurd bi vî rengî tên belavkirin. Û tiştê herî xerî-



rib û balkêş ew e, ku li ser kaseta Ciwan Haco, ya bi navê “Çaw Bella” ev hatiye nivisandin: “Kopîkirina berhemên vê kasetê qedexe ye” Hûn dibînin ku dizê vî welatî çendî rûçiriyayî ne! Diz dibêjin dizî qedexe ye!... Navê stranên jî bi temamî xelet hatiye nivisandin.

Di cihê “Li hev hatiye” de “Lemhatya”, di cihê “Pêjna te nayê” de “Bejna te nayê” û di cihê “Ez xortekî ciwan bûm” de jî “Xorta cinan bu” hatiye nivisandin. Dibe ku hûn bibêjin, “Ma we aqilê xwe xwariye, ku hûn ji dizan têkûz nivisîna kurdî hêvî dikin? Rast e, di vî mirovê vî yekê jî wan hêvî neke, lê dema me ew meroz kirin û em li wan geriyên, me dît ku diz bi xwe jî “hunermede kurd” e. Belkî we navên wan bihîstibe, heta îro bi navê “Zozan û Welat” çar kasetên wan ên bi kurdî derketine. Welat (Yavuz Çapan) dev jî “hunermendiyê” berdaye û dest bi korsaniya kasetên kurdî kiriye. Şirkê wî yê vî kerî jî, yekî bi navê Mehmet Bozan Artıkboğa ye. Li ser kasetê navnîşaneke xeyalî danîne.

Me jî Ciwan Haco pîrsa “Haya we, ji belavkirina kasetên we yê bi korsanî heye an na? Û dîtina we li ser vî çî ye?” kir, wiha bersiv da:

–Ez pê nehesiyabûm, vêga hîn bûm... Ezê çî bibêjim? Ev tiştê gelek bêexlaqî ye. Hûn dibêjin yê ku ev kiriye jî hunermendekî kurd e, ew ne



hunermend e, diz e. Bawer bikin heta îro, min tu feydeyek ji kasetên xwe nedîtiye. Lê vî carê ezê ebûqatekî bigirim û di heqê wan de dozê bidime vekirin.

Me eynî pîrs jî Şivan Perwer jî kir, bersiva wî jî ev bû:


–Hinek dîkin, hinek dixwin.. Heke kurd bin, xwe kurd dihesibînin, welatperwer dihesibînin, gerek e vî nekin. Ku hewcetîya wan bi vî karî heye, dixwazin bikin, bila li me bigerin, emê piştgiriya wan bikin, alîkarî bidine wan. Ne hewceyî diziyê ye. Van zilm û zora dewletê ne bes ditine ku diziyê jî lê zêde dikin..

Xwediyê şirketeke ku kasetên kurdî derdixe jî, li ser bi korsanî belavkirina kasetan, giliyên xwe bi vî awayî tîne zimên:

–Dizîya van li me bû derdê ser derdan. Jixwe ji aliyekê ve dewlet dixwaze me ji vî karî bide paş. Naxwaze bi kurdî tiştê were çapkirin, kasetên me berhev dîkin, li dadgehên di heqê me de dozê vedîkin. Û devera ku dewlet bi xwe tiştêkî nake, ev diz dîkin...

RAHMÎ BATUR

## Li me hemûyan pîroz be



C. YÖYLER

**B**i munasebeta derketina Rojnameya “Azadiya Welat” ez dixwazim bibêjim weşana vî rojnameya birûmet, li me hemûyan pîroz be. Belê bila pîroz be, li hemû kesên xwenas û welatparêz; li hemû têkoşerên di girtîgehên de, ew ên ku bi berxwedanên xwe yê birûmet serfirazî û serbilindî û rûmeta gel in. Pîroz be li hemû xwendevanên birûmet.

Gelî heval û hogirên xwenas û zana, gere hûn girîngiya çapemeniya navneteweyî û ya gelê kurd bi rewşeke zelaî bînin ber çavên xwe û li ser bi hûrnêrînen xwe yê birûmet rawestin. Wê demê hûnê girîngiya çapemeniya gelê xwe bibînin. Belê hûnê pir rind û baş bibînin ku, pirên rojname, kovar ên

navneteweyî, ango yê cihanê, heke qala şoreş û tekoşîn û berxwedana gelê me bikin jî, pirê wan nûçe û nivîsên xwe bi xweber nakin, bi alîkarî û agahdarî û balkêşiya çapemenî û weşanên kurd dîkin.

Ev çapemeniya me ya ku heyên îro di riya tekoşîna çapemenî û weşenkariya gelêrî û şoreşgerî de bi sedan şehîd daye.

Pêwîst e li ser her kesê ku dibêje “Ez kurd û şoreşger û welatperêz im”, piştevanî û alîkariya weşanên xwe yê mîna rojname, kovarî û yê bi her awayî bike. Lewre em hemû bi hev re di vî xebatê de û ji bo alîkariya doza mirovahiyetê berpirsiyar in; hem li hemberî Xwedê, hem jî li hemberî gelê xwe.

Têkoşîna gelê me, têkoşîneke pir

birûmet e, lewre têkoşîna serfirazî û serbilindî û azadiyê ye. Ev têkoşîna hanê her bi tenê ne ji bo gelê kurd, ji bo hemû kesên “Rojhilata Navîn” e, nemaze ji bo rizgariya wan gelên ku bi xwe ji dagirkerên welatê me ne. Her çiqas dagirker in jî, gelên wan jî di warê demokrasiyê û jiyaneke serbixwe de ne azad in, ew jî di binê mêtîngeriya rejimên welatên xwe de diperçiqin. Lê mixabin pirên wan xwe nas nakin û nizanin ku çawa diperçiqin.

Ez dîsa dibêjim gelî welatparêz û xwenasan, li çapemeniya xwe xwedî derkevin, bistînin, bixwînin û bidin xwendin. Hem jî ez careke din dibêjim, “Azadiya Welat” li me hemûyan pîroz be.



# Hevalê Waşinton kumandarekî baş bû

**L**i girtîgehekê, girtî ji bo hêvotînê (telimê) ders didine hev. Di nav girtiyan de kesên nexwende û nezan jî hene.

Ji bo dersê girtî li hev kom bûne. Semînerdar, dest pê dike xebata xwe pêşkêş dike. Di nav axaftinên wî de navê Washington jî derbas dibe.

Piştî ku semînerdar, semînera xwe diqedîne û ji beşdaran dipirse, ka pirsjê re hene an na da ku hûn bibe û kesên ji mijarê serwest nebûbûn, car

din vebibêje Pirs tên kirin û bersivên wan tên dayîn. Semîner diqede. Du heval derdikevin hewşa qawîşê. Yek jê pirsra ku di dema di dersê de nekiriye, ji hevalê xwe dipirse:

-Tu bi Xwedê bikî, Weşinton kî ye?

Yê din hema bi lez lê difetîlîne.

-Ma tu nizanî heval? Wele pir şerm e. Tu çawa wî nas nakî? Hevalê Weşinton kumandarekî pir jêhatî û baş bû. Lê çi heyf şehîd ket.

## Kerê aqilmend

**C**otkar her roj cot bi her du gayên xwe dikir û ker li malê dima. Rojekê ker ji her du gayan re dibêje: "Xêr e hûn her sibê diçin û êvarê tî? Hûn li derve çi dikin, ma hûn nikarin rojekê bêhnê bidine xwe û li nav tewlê bimînin?"

Ga: "Çawa emê li axurê bimînin?"

Ker: "Yek ji we xwe biavêje erdê û ranebe, hûn jî naçin cot."

Gotina ker dikeve serê her du gayan. Sibehê, pîreka cotkar tê li axurê dinihêrî ku gayekî xwe avêtiye erdê. Pîrekê alif da ber, ga nexwar. Serê wî rakir, ket xwarê, teriya wî kilkir ga ranebû. Jî-nîkê çû ji zilamê xwe re got. Zilam got: "Çima jî-nîk, ma wa ye ker" Zilam rabû ker ji cihê ga birre cot.

Wexta ku bi rê de diçûn, ker ji xwe re dibêje:

"Te dît min li xwe çi kir."

Cotkar ga û ker girêdan û heya êvarê cot bi wan kir. Cotkar rabû çi kevîrê nava zeviyê hebûn, bi ker avêtine dervayî zeviyê.

Cotkar rabû berê xwe da malê û çûn. Wî, ker û ga berî nava axurê dan. Gayê nexweş ê ku li axurê mabû, ji ker re got: "Birawo, cot çawa bû?"

Ker: "Lawo ma ji cot xwestir, lê ez birayekî xwe wînda dikim. Xwediyê me çû cem qesap. Wê te bifiroşê"

Bi van gotinên ker ga hûlorî ser xwe bû û da çirivîtan. Li hundirê axurê çi giya hebû xwar. Ker ji xwe re got: "Ez aqil didim hevalê xwe, di serê min de diteqe. Êdî ez careke dinê aqil nadim tu kesî."

ZINAR ALMAZ

## Qaçilê pîvazê

**M**ele Evdê Dêrdûkî li ser mahserekê dibîne ku qaçilê pîvazê ketiye teştadims a gundiyeke. Ji gundî re dibêje:

-Ev dimsa te heram bûye

Gundî dibêje:

-Çima Seyda?

Mele Evdê li ser pirsra gundî dibêje:

-Ev pîvaz di nav axa bi zibil de çêbûye. Ev qaçilê pîvazê heram e, dimsa te jî heram kiriye. Tu vî dimsî rake bibe li mala me deyne. Li vergerê ezê li serê bixwînim.

Gundî dims dibe datîne mala mele. Mele ji gundiyan tevan dims berhev kiriye û xistiye denê xwe.

Gundiye me jî radihe qaçilekî pîvazê diavêje hundirê denê mele û vedigere dibêje:

- Seyda qaçilê pîvazê ketiye nav denê dimsê te û dimsê te jî heram bûye.

Mele Evdê radibe, diçe qaçilê pîvazê derdixe û li ser yê gundî dizivire. Dibêje:

- Hey bêhişo! Ê min pelê bin pelê ye. Tu xesara wê nîn e ji dims re.

BERHEVKAR  
BEDRAN BÊNAV

## Navinen entîke

**H**emin em derdikevin pêşberî we, me xwest em hin navên entîke jî biweşînin. Da ku hûn wan li zarokên xwe bikin. Bêhtir jî li wan zarokên ku bi hatina Azadiya Welat re hatine dinyayê. Ha ji we re çendik ji wan navan:


- Çevbeqo
- Gohbelê
- Sermezîne
- Diranfîqo
- Devlewitiyo
- Bixwerenedîtîyê
- Çimsûro
- Pêpehno
- Pozbilîkê
- Çêweşayî
- Emirquto
- Gilêzgin
- Nikulsorê
- Çilmin
- Çavşûjîno
- Peritiyê
- Hetekê
- Lêvdormik
- Serker
- Kafhesin
- Dilberaz
- Serhişk
- Cegertune
- Teşîkxwar
- Fêhmker
- Zimandirêj
- Enîdindoq
- Dranmişk
- Hûrker
- Destqop
- Çepildirêj
- Zikberos
- Berxwneketî
- Serkundir
- Totikvala
- Mexelker
- Serconeqa
- Stewartal
- Hûrçêlî
- Devhîrç
- Pozker
- Hûrmeşk
- Kakdewar
- Bedilkinbûyî
- Pozdirêj
- Enîphen
- Botirgirt
- Çevbeloq
- Diranbeş
- Zikzebeş

### XELAT...

### XAÇEPIRSA BIXELAT (1)...

### XAÇEPIRS

Malxwey	Şilik	Staran lawik	Notayek	Bi rewya	Hedan
Serokekî kurd (wêne)	Erdê çadîniyê	TVya kurdi	Tesîr	Mirad	
→	↓	↓	↓	↓	↓
Xînîsî	2			Rêxistin eke Îrlanda	5
Erdê Cotkiri		Paytexta Jordanê			yan dek
7		Neon			
Îrade		Gey		imarbûzî	
Liva hewayê		Hezan		Sulh	
→	Parkîtek	1	Nivîn	→	
	Gîrekek		Rewing		
Sodyum	3	Hicûm			
Hidrojen		Ehd			
↓	Navekî Jinan	↓	4	Cînav keke îşarkî	
	Daçekkek				
Hafîza	Dîlan	→			
→		Nivçe	→		



Berga pirtûka 'Ji nav şîrên min'

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 1'an kitêba 'Ji nav şîrên min' a Şêrko Bêkes e.

#### Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

PEYVA VEŞARÎ

- 1
- 2
- 3
- 4
- 5
- 6
- 7



**Çiçek**

\*  
LI ŞERRAWESTINÊ  
PROVAKASYON  
HATE KIRIN!..

11 gundiye  
Kurd hatin  
şewitandin.

\*  
A. GİGEK.



# Kurd tim têne fîtkirin!

**D**i 27'ê sermawezê de, Mebûsê Eskişehirê Abdullah Azmi Hoca, berî vî bi rojêkê Kazim Karabekir, di 7'ê berfanbarê de Mebûsê Edirneyê Cafer Tayyar Paşa ji CHF'ê istifa kirin.

## Xwebirêxistina dijberan

Piştî van îstifayan, di demeke kin de, bername û rêzikên partiyê hatin amadekirin. Partiya nû, di 17'yê sermawezê 1924'an de hate damezrandin. Komîteya Rêveber ya partiya nû, ji van kesan pêk dihat: Ali Fuat Paşa, Rauf Beg, Adnan Adıvar, Ahmet Muhtar Beg, Halis Turgut, Sabit Beg



û Rüştü Paşa. (Feridun Kandemir, Siyasî Dargînlıklar, C.3, r.18-19 İstanbul, Ekincigil Mat.1959) Hinek endamên partiyê yê din ev bûn: Rafet Paşa, Bekir Sami, İsmail Canbulat, Şükrü, Feridun Fikri, Halet, Besim, Arif, Münir Hüsrev, Faik, Halit, Kamil İhsan û Zeki Beg.

Li vir navên ku ez dixwazim balê bikişînim serê ev in: Feridun Fikri (Düşünsel-Dêrsim), İhsan (Erxanî), Sabit (Sağiroğlu-Erzincan), Halet (Erzerom), Necip (Mêrdîn), Halis Turgut (Sêwaz). Van kesan di dema dengdayîna pêewlehiyê de, dengê neyînî dabûn hikûmetê. Her wiha piraniya van kesan beşdarî avabûna TPCF'ê jî bûne.

Wekî ku tê dîtîn, 9 mebûsên ku ji herêma kurdan hatine, beşdarî vê tevgera yekemîn a dijber bûne. Di destpêka jiyana siyasî ya Komarê de, ev jihevçûna yekemîn, dibe hîmê partiyekê nû. Niha divê tesbîteke ku ji bo dîroka siyaseta kurdan girîng e, bê kirin. Erik Jar Zürcher dide zanîn ku 19 mebûsên ji CHF'ê veqetîne, bi temamî li dora Rauf Begê neciviyane. Piştî re jî ew van rêzên ku divê em bi baldarî li serê lêkolînê bikin dinivîsîne:

-Di nava van sê heftiyên de rastîyeke ku derket holê jî ev bû: Ew hemû kesên îstifakar di nava koma Rauf Beg de, cih nagirin. Hinek ji van kesên li dervemayî mebûsên muhafazakar ên ji Rojhilat bûn. Wan dan zanîn ku, ewê li ser xetêke serbixwe siyasetê bikin. (Erik Jan Zürcher, Terrakîpver Cumhuriyet Fırkası, Bağlam Yayınları, İstanbul, 1992, r.74)

## Baweriya ku kemalî pêşve rû û dijber jî paşverû ne

Li gorî agahiyên ku min ji çavkaniyên cur bi cur xwendine, heta dawîya meha sermawezê 42, li gorî hinek çavkaniyan 43 kesî ji CHF'ê istifa kirine; Zürcherê ve hejmarê dîke 45. Ji van kesan 32 mebûs beşdarî nava refên TPCF'ê bûne. Niha mijara me kesên ku ji herêma kurdan wekî mehûs hatine tayînkirin in. Piştî ku min hinek çavkanî tevdan, ev lîste derket pêşerî min:

- 1- Sabit (Sağiroğlu), Erzingan
- 2- Halet (Sağiroğlu) Erzerom
- 3- Münif Hüsrev (Göle) Erzerom
- 4-Rüştü, Erzerom
- 5-İhsan, Erxanî
- 6-Feridun Fikri (Düşünsel) Erzerom
- 7-Halis Turgut, Sêwaz
- 8- Bekir Sami (Kunduh), Sêwaz
- 9-Ömer, Qers
- 10-Ziya, Erzerom
- 11-Raif (Dinç), Erzerom
- 12-Necip, Mêrdîn
- 13-Feyzi, Diyarbekir
- 14-Rahmi, Sêwaz
- 15-Ömer Şevki, Sêwaz
- 16-Abdulxanî, Mêrdîn

Wekî muhafazakar nîrxandina van 16 mebû-

sên ji herêma kurdan ji aliye Zürcher ve, bi dîtina min ne objektîf e. Ev mebûsên ji herêma kurdan, di gel ku ji aliye hikûmeta kemalîst ve wekî mebûs hatine tayînkirin jî, li hemberî kirinên hikûmeta kemalîst derketine, gotinên wekî, "Rejîma Mustafa Kemal Paşa ber bi diktatoriyê ve diçe" bi lêv kirine.

Li Tirkiyeyê pir kes, bi taybetî çavkaniyên çepgir, dijberiya vê demê wekî dijberiyê kevnepereşt û muhafazakar bi nav dikin. Çepgirên vê demê, TKP û Internasyonal, van mebûsên ji herêma kurdan (hinekên wan ne kurd in) wekî kevnepereştên li dijî reformên kemalîst ên pêşverû û kesên li dijî pêşketinên hejmarî dinirxînin.

Kadroyên TPCF'ê, hevalên M. Kemal Paşa yê şer û rêveberên Têkoşîna Neteweyî ne. Ew bi avabûna komarê jê veqetîne û partiyeke dijber ava kirine.

Dûmahîk heye....



**WELAT**

Gerînendeyê Weşanê: MEHMET GEMSİZ  
(Genel Yayın Yönetmeni)

Lijneya Weşanê: SAMİ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMİ BATUR  
(Yayın Kurulu)

Gerînendeyê Karê Nivîsaran: DÜZGÜN DENİZ  
(Sorumlu Yazışleri Müdürü)

Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti.  
Xwedî (adına): CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Saziye: TAHİR ELDEMİR  
(Müessese Müdürü)

Navnîşan: Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/İstanbul  
Tel-Fax: 293 53 19

Çapxane (matbaa): Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.  
Belavkirin (dağıtım): BBD (Birleşik Basın Dağıtım A.Ş.)

Haftalık Kürtçe Gazete



